


PEYAMA Kurd

Hejmar 68 | 23.12.2005

Kurdish weekly newspaper

Zeyneb Hemreş Reşo:
Ez Kolikê bi malê
dinyayê tevî nadim,
jiber Hemreş li wir
raketiye

Rûpel 8-9



Serokê PDK-Bakur
Hemreş Reşo



Swêd de
defîleya
kincanî
kurdan

Rûpel 16

17 Kanûnê
61emîn salroja
bilindkirina
Ala Kurdistan
bîroz be

Rûpel 12



Keremê
Seyad
Xelata
Rêzgirtinê
wergirt

Rûpel 6



Serokê Kurdistanê
Mesûd Barzanî:
Ez bangî Kurdên bakur
dikim ku bi hikumetê re
bikevin diyalogek
pozîtîv!

Rûpel 7

Êrîşên liser
malperên Kurdistanî
berdewam in

Rûpel 6

Grûba Kurmancî li
Parîsê bû

Rûpel 10

70 sal û 100 romanên
kurmancî -2-

Rûpel 14

SALNAME 2006

KOMKAR



Parlamenta der Yekîtiyê Kurdîstanê
Yekîtiya Komênên Kurdistanê
Kurdistanê (KRC)

Derwêşî: 2, Şarîfîyê
Tel: 0375 124 21 21 Fax: 0375 111 35
e-Mail: krc@krc.gov.krd



D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, CR 1.70 EUR



4 196577 401503 68

Civîna Amedê doza mafê çarenûsî kir



Rûpel 5

Kurtênîce

Tam du mehan ji nav nivînan ranebûn

PK - 12 jinên ji Swîsre, Îskoçya, Finlandiya û Fransayê jibo taqîyeke (ceribandinek) Ajansa Fezaya Ewrûpa ku xwest bandora hawîra bêgiranî liser bedena jinan bipîve, ketin nav nivînan.

12 jinên kobay 2 mehan di nav nivînekê ku sewiya ling ji serî bilindtir û piştî wan bi goşeyek (qûç) 6 dereceyî raketin.

Di du mehên heyama berexêrbûnê de destûra jinan hebû ku pirtûkan bixwinin, li televizyonê binerin, muzîkê guhdar bikin û têkevin internetê. Lê di vê demê de jinan tenê bi tîmên tendurîstiyê re dan û standin kirin.

Piştî du mehan her jinekê jibo vê xizmeta xwe 15.200 Euro wergirtin.

Li Tirkîyê 38 hezar zarok berî 1 saliya xwe dimirin

PK - Li gora rapora Wezaretê Tendurîstiyê ya bi navê "Rapora tendurîstiya dayikê û zarokan" li Tirkîyê her sal 1 milyon û 400 hezar zarokên tînyê û ji wan 38 hezar jiber sebebên ku dikare rê liber bê girtin berî 1 saliya xwe dimirin.

Ji van zarokên ku berî yek saliya xwe diçin ser dilovaniya xwe ji piranî yek mehî û ji wan jî sedî 66 yek hefteyî ne.

Rapor diyar dike di bin 20 saliya xwe de yekem ducaniya dayikê riskek mezine û divê her di bin venêrana (kontrol) dixorê de be.

Gena ku rengê çerm diyar dike hat dîtin

PK - Li gora nûçeya kovara Science genetîkvanên Amerîkî wexta ku liser pençeşêrê lêkolînek dikirin bi tesadufî gena ku rengê çerm diyar dike dîtin. Ev gen yek ji mezintirîn sura biyolojiyê tê qebûlkirin.

Genetîkvanê Zanîngeha Pennsylvania Keith Cheng didêje ku, "tenê yek guherandinek di amîno asîta ku di gen de ye, di rengê çerm de rolek mezin dilîze û eşkere dike ku jiber çî rengê çermê Ewrûpiyan jî yê Afrikiyan vekirîtir e."

Gena ku nû hat kifşkirin di tedawiya girantirîn pençeşêra çerm de jî dikare bê bikaranîn.

Ev gena nûdîtî di pêşerojê de jî dêvla madeyên kîmyewî jibo vekirina rengê çerm de jî wê karibe bikar bê anîn.

Li gora kovara Science genetîkvan eşkere dikin ku heta niha jî sura genên ku bandorê liser rengê nîjadî dîke veşartî ye.

Peyama Kurd
bixwîne bide xwendin

80 milyon keçik berî 18 saliya xwe bi zorê tînyê zewicandin

PK - UNICEF bi raporekê eşkere kir ku li seranserê dinyê salê 80 milyon keçik berî 18 saliya xwe bi zorê tînyê zewicandin. Rapor diyar dike ku li herêmên ku zewaca bi daxwaza keçikan lê zêdeye kevneşopiyên netewî rê liber protestoya keçikan digire û zewacên kudi temenê biçûk de tînyê kirin tendurîstî û jiyana keçikan dixê xeteriyê. Her wiha UNICEF bal dikşîne ku zarokên keçik bi van zewacên bê wext û bê dilê xwe mecbûr dimînin ku rola kemlanan bidin ser milên xwe ku ev jî wan ji mafên perwerdiyê û jiyana xwe ya zarokîyê bêpar dike. Di rapore de hatiye nîvîsandin ku, "her sal bi




milyonan keçik dikêvin kemîna zewaca bê wext û tînyê wînda kirin".

Li gora rapore li Asyaya Başûr jî sedî 48ê jinên 15-24 salî berî 18 saliya xwe tînyê zewicandin.

Rapor diyar dike ku rîska mirina ducanî û zayîna dayikên ciwan gelekî zêde ye. Di dema zayînê de rîska mirina keçikên di bin 15 salî re li gora yê 20-29

salî pênc cara zêdetir e. Şansa jiyana zarokên ku keçikên biçûk tînyê di dînyê jî ya jinên gihiştî jî sedî 60 kêmîtir in.

Li Rûsya di her seetê carekê de jinek tê kuştin



PK - Li gora rapora Rêxistina Efûyê ya Navnetewî (RE) li Rûsya her sal 14 hezar jin ji aliyê mêrê xwe ve tê kuştin. Koordînatore RE li Rûsya Fredierike Behr ragihand ku li gora daneyên (done) sala 2004an nêzîkî 36 hezar jin ji mêr an merivên xwe lêdanê dixwin, jî her çar malbatan yekê de bi awayekî periyodîk jin lêdanê dixwin lê jî sedî 40ê jinan qet serî li polîs nade û ev mijar di belgeyan de qeyd nabe.

Berpîrsên RE li Moskovayê di civînekê çapemeniyê de eşkere kirin ku li gora daneyên Wezaretê Karê Hundir ya Rûsya di sala 2003an de 9 hezar jin ji aliyê mêr, yar an merivên xwe ve hatiye kuştin.


Fredierike Behr got ku seba zêdebûna şideta di nav malê de dibe ku jiber şerê Afganistan û Çeçenistanê, alkôlîzm û kevneşopiyên candî û civakî be.

Li gora rapore resmî ya Rûsya di sala 2002an de jî Rêxistina Neteweyên Yekbûyî re hatibû şandin, her sal li vî welatî 14 hezar jin ji aliyê mêr an merivêkî xwe ve tînyê kuştin.

Jin jî taciz û tecawiz dikin

PK - Li Amerîkayê niqasha mamosteyên jin yê ku bi xwendekarên xwe re dikevin pêwendiyên cînsî dibe. Ev çend mehên dawî mijara mamosteyên jin û xwendekarên ciwan rûpelên rojnemayan dixemilîne. Li gora rojnameya, "mamosteyên jin li derek nerast li bextewariyê digerin".

Li gora îstatîstîkan jî sedî 40ê kesên ku xortên di bin 16 salî de taciz dikin jin in. Îsal gava 14 mamosteyên jin jiber tacizê hatin cezakirin mijar ket rojeva welêt û bi awayekî tund tê niqaşkirin. Psikolog taciza ciwanan bi Hollywoodê ve girê didin. Jiber ku stêrkên wek Demi Moore, Cameron Diaz, Diane Keaton her bi yarên xwe yê jî xwe ciwanî li ber çav in dibe seba mamosteyên jin yê ku bi zewaca xwe ne bextewarin berê xwe bidin xwendekarên xwe. Nûçeyên di çapemeniyê de belav dibin jî cesaretê dide mamosteyên jin. Çapemeniya Amerîkayê mamosteyên tacizker yê mêr wek "apore



(gumreh, sapik) û subyanker", lê jinên ku eynî karî dikin jî, "bextreş, kesa ku li bextewariyê digere" binav dike.

Hestên jinên ku di ciwaniya xwe de hatine dewisandin bi vî awayî xwe derdixê holê.

Berces ji herdû çavan kor e lê...


PK - Berces Tekinê Batmani ji herdû çavên xwe kor e, lê ew jibo debara malbata xwe di lêkirina avahiyan de kar dike.

Berces Tekin li Batmanê, li taxa Yavuz Selim, kolana 3543 rûdine. Zewicî ye û bavê zarokê ye.

Berces ji çêbûna xwe ve ji sedî 90 kor e, lê ji ber ku li Tirkiyê mafên kêmnetewan nehatine birêkûpêkkirin û ew ne xwediyê tu miaşî ye, ji neçarî û jibo debara malbata xwe di lêkirina avahiyan de kar dike.

Berces dide zanîn ku ew di dema kar de gelek caran ketiye, birindar bûye û êşiyaye, lê ew neçare vî karî bidomîne. Ew li cem pismamê xwe kar dike jiber ku kesekî din kar nade wî.

Pismamê wî Ayvaz Tekin ji dibêje, "Berces ji



sedî 90 kor e. Jiber ku kes karê min ji karê lêkirinê ji rayedar û karbidestan kar nade wî, ez wî li cem ye, jibo wî zor e, lê tişteki daxwaz dikim ku alîkariya wî bikin.

Li Dêrikê du binemalên xwînî lihev hatin



PK - Li bajarê Dêrika Çiyayê Mazî, doza xwînê ya di navbera du binemalan de bi aştiyê hat çareserkirin û rê liber dijayetiye hat girtin.

Di navbera malbatên Çelîk û Dogan de berî sal û nîvekê şer derketibû û ew bûbûn xwîniyên hev. Di encama hewldanên serokê eşîra Metîna, Şerîf Temellî de herdû malbat di xwarineke hevbeş de li hev kom bûn û destê biratiyê dirêji hev kirin. Di xwarina lihevhatinê de 500 kes amade bûn. Jibo xwarina aştiyê 15 pez, ton û nîvek birinc, tonêk fasolî û hezar nan hatin bikaranîn. Di dawiya xwarinê de endamên herdû malbatan destê xwe dan hev û hêvîkirin ku lihevhatina wan bibe nimûneyeke baş jibo malbatên din yê xwînî.

Hayê dewletê ji hebûna wan tune ye

PK - Şênîyê gundikê Şexanik yê girêdayî Sasonê, heta berî demekê ji li cem dewletê ne qeydkirî bûn û nifûsên wan tunebûn. Piştî ku dewlet bi hebûna wan hisiya, ew kirin xwedî nifûs, lê pêwîstiya gundiyan ji nifûsê bêtir bi av, ceyran, dibistan û rê heye. Gundiyan gundikê Şexanikê jibo çûna Sasonê 4-5 seetan dimeşin, eger zar û zêç ji hebin, dirêjbûna rê dibe 7-8 seet. Jiber vê yekê piraniya xelkê gund hîna sason nedîtine û ji gelek tiştan bêpar in. Huseyîn Acarê ku yek ji şênîyê gundikê dibêje, "Em ji tu başiyên şaristaniyê sûde wernagirin, me nifûsên xwe wergirtin, lê em hez dikin ku dewlet ne bi tenê jibo nifûsan, lê jibo



pirsgirêkên me yê din ji hişyar be û li me bipirse. Li gundê me rê tune ne, av û ceyran, dibistan û mizgeft tune ne, pêwîste ev ji bendeştin û çareserkirin."

6 hezar zarok bi pêlav kirin

PK - Karbidestê Kurd yê ji Agirî Ahmed Sagin, li navenda bajar û navçeyên derdorê 6 hezar zarok kirin xwediyê pêlavên nû. Sagin, ligel midûrê perwerdeyê, dibistan bi dibistan geriya û pêlavên kargeha xwe MP diyarî zarokên xizan kirin. Karbidestê Kurd yê xwediyê kargeha pêlavan MP dide zanîn ku ew her sal bi hezaran pêlav

diyarî zarokên Agiriyê dikin û kêfa wan tînin. Liser vê şewaza alikariyê Ahmed Sagin dibêje, "Em her hewl didin ku ligel xelkê xwe bin û alikariya wan bikin. Gelek xwendekarên dibistanan bê pêlav bûn. Em weke kargeha MP, berhemên xwe diyarî wan dikin û emê her ligel wan bin."

Panorama

Dilbixwîn Dara



Kovara Çiya

Sal baş nayê bira min. Yan 84 yan ji 85 bû. Ez nû fêrî xwendin û nivîsandina kurdî dibûm. Ez xwendevan bûm û hewesa fêrbûna nivîsandin û xwendina bi kurdî tîpên latîni li cem min gelekî mezin bû.

Wan salan peydakirina pirtûkên kurdî pir zehmet bû. Carekê ez rasti diwaneke Cegerxwîn hatim, li cem dostekî xwe ji min carekê pirtûkeke Osman Sebrî dit. Di wan salan de pirtûkên kurdî li cem her kesî peyda nedibûn, hem ji kesên ku li cem peyda bibana ji, raberî her kesî nedikirin, ew weke sîc dihatin hesabandin û girtina wan ceza bû.

Carekê dostek hate cem min û got: "Min ji te re ji Libnanê kovareke kurdî aniye, wê kêfa te gelekî jêre were, gelek helbest, çîrok, gotar, serpêhati û mijarên cuda tede hene..." min xwe ranegirt, wê seve min avête ser mala wî dostê xwe. Min kovar anî mal û ketim nava rûpelên wê. Bi rastî ji kêfa min gelekî jêre hat. Wê demê min nizanibû bi kurdî bixwînim, lê min pir li xwe zor kir. Her çiqas jibo min zehmet bû ji, ji bo fêrbûnê min pir îsrar kir.

Kovara di nava destên min de ÇIYA bû, rehmêtî Hemreş Reşo derdixist.

Di wan salên dijwar de û bi derfetên hindik derxistina kovareke weke Çiya, ked û xebateke mezin dixwest. Hemreş Reşo ew fedekarî da ber çavên xwe û kovar derxist.

Kovara Çiya di kanûna sala 1965 de ji aliyê Hemreş Reşo ve hate weşandin.

Sal di ser re derbas bûn.

Di dilê min de her hebû ku ez rojekê rehmetî Hemreş bibinim û jêre bibêjim ez minetdarê ÇIYA me.

Mamosta Hemreş nexweş ket û ez li nexweşxaneyê çûme serdana wî. Ez pir êşiyam, pir zêf bûbû, dema ku çavên xwe vekirin, beşîşî û got: "min di televizyonê de li te temaşê dikir, kurdiya te pir bi rêk û pêk e..." Min got: "Ez hatime bibêjim, ez deyndarê ÇIYA me..." keniya û got: "gelek kes dibêjin em bi riya wê fêrî xwendin û nivîsandina kurdî bûne, ev min gelekî kêfxweş dike..."

Rojekê serê sibehê telefonêk ji min re hat û nûçeya wefata Hemreş ragihand.

Min gelekî xwest biçim serdana mala Hemreş û biroya wî ya xebatê bibinim.

Duh em li mala wî bûn. Em li derî didin, kurê wî tê derî vedike, bi xêrhatina me dike.

Piştîre xanima wî Zeyneb xanim li ser nazikî û jiyana wî diaxîfe. Dibêje, mal ji mêvanan vala nedibû. Wî bi xerîngî tîne bira xwe.

Derbasî biroya wî dibim. Rastî arşiveke gelekî dewlemend tem. Çûye kuderê bi xwe re yan kovarek, pirtûkek, rojnameyek, yan ji nexşeyeke Kurdistanê... aniye. Li hevpeyvîneke wî temaşê dikim, Berdirxan Epozdemir pêre çekiriye, li ser pêwîstiya çekirina arşiveke kurdî diaxîfe.

Di arşiva Hemreş de, li kêleka bi dehan kovar, rojname û pirtûkên ku berî 60-70 salan hatine weşandin û bi hêsani peyda nabin, bi dehan name û destnîvîs hatine parastin.

Hêvî dikim ew arşiva dewlemend bêxwedî nemîne û hinek saziyên Kurdan rabin û dest bavêjinê.



Cemal Batun

Tabloya Hilbijartinê...

Hin encamên hilbijartina Iraqê eşkere nebûne. Mizêna desthilata siyasî dê biguhere yan na-hin jî ne diyar e. Tiştêkî xuya ev e ku Hevbendîya Şîa dîsa dibe hêza yekemîn, Hevbenbiya Kurdistanê hêza duwemîn. Di navbeyna van her du hêzên sereke de hevbendîya derdora Eyad Elawî û hin hawîrdorên din jî dikarin bicîh bibin. Pêşbiniyên girêdayî hilbijartina Iraqê Federe, encamên heta niha hatî pêş-tabloyek gelek balkêş radixe ber çavan. Ji alî me kurdan ve ew çawa xuya dike...

SERKEFTINA KURDISTANÊ

Li gor pêşbiniyên hatî diyarkirin, Hevbendîya Kurdistanê serkeftinek gelek mezin li coxrafya Kurdistanê: di sinorên herêma federe ya Kurdistanê û herweha ew aliyên Kurdistanê ku hin jî ne di nav sinorê herêma federe de ne-Şingal, Xanîkî, Kerkûkê û devera Musilê bidestxistîye. Hevbendîya Şîa yan jî aliyên Iraqî bêje ku li Kurdistanê qet deng werne-girtine. Ev nîşanek

Gelek eşkere ye: Kurd daxwaza desthilata xwe dikin. Kurd dixwazin welatê wan jî alî Hevbendîya Kurdistanî ve bête birêvebirin. Kurd jî hevbendîya PDK-YNK dilxweşin. Kurd naxwazin destê hevbendîya şîa yan jî aliyên din ên Iraqê di coxrefya Kurdistanê de xwedî giranî be. Kurd jî bernamê û xebata Hevbendîya Kurdistanê memnun in.

Li gor pêşbiniyên derketî, herweha xuya ye ku Hevbendîya Kurdistanê jî dengên li herêma Kurdistanê hatî dan jî %75an zêdetir ra wergirtiye. Piştî hevbendîyê dengê jî pêşbiniyên hatî kirin kêmtir (lê dîsa bi sînyal bi taybetî li Silêmanîyê) ya Yekgirtîya Îslamî, piştî wan jî li Dihokê di rêza seyem (4695 ra) û li Hêwlêr di rêza çarem de (1599 ra) de Partiya Refaidin ya Asurî hat.

Ev serkeftinek mezin ya tevgera siyasî Kurdistanê ye. Pêşewaziyek bi mane ya gelê Kurd jî bo rêzaniya Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî û Serokomarê Iraqê Federal Celal Talabani ye.

HEZIMETA BEXDAYÊ

Li gor encamê hatî diyarkirin, li paytexta Iraqê Federe, Bexda Hevbendîya Şîa 1,5 milyon deng wergirtin. Hevbendîya Kurdistanê jî 25 hezar. Mirov nikare bawerî çavên xwe bike! Çawa çêdibe? Brayên me yê Başûr dibêjin li Bexdayê 1,5 milyon Kurd dijîn. Dibe ku jî milyonek jî wan zêdetir brayên me Kurdên Feylî bin. Ma gelo ew jî ne Kurd in? Bi rastî, bi sed êşî gava min bi xwe ev encam bihîst, gotina Serokwêzîrê Tirkîye Recep Tayîb Erdogan a: nasnameya jor, nasnameya jêr hate bîra min! Xuya ye jî bo gelek xûşk û brayên me yê Feylî: nasnameya jor a şîayetîyê berî ya kurdewerîyê were. Lê ev rastî tu caran paşçav nabe: pêşeroja rojên şad, serbixwe û serbest jî bo Kurdên Feylî jî, jî azadî û serkeftîya Kurdistanê derbas dibe. Desthilata neteweyî ya erebî çî bi sînnê, çî bi şîa: jî bo Kurdistanê jî, jî bo Kurdan bi giştî jî ne mîsogerîya pêşerojek bextewer e. Lê demokrasî van dersan jî derdixê pêş mirov: tevgera siyasî ya Kurd jî, siyasîmedarê Kurd ên Feylî jî: dive xwe bigihînin raya giştî ya Kurd li Bexda û daxwaz û hêviyên wan di çarçoweyek zanyar de formule bikin û bersiva wan hevîyan binin pêş.

ENCAM

Bi hezîmeta Bexdayê û serkeftina li Kurdistanê ve; herweha serkeftina hevpeymanîya Kurdistanî li derveyî welêt (li hin malperên internetî yê Kurdî hate nivîsin ku li derveyî welêt li gor berê kêmtir ra hatine dan û nimûne jî Swêd tê diyarkirin: ku qet ne rast e! Li Swêdê di hilbijartina meha çîleya paşîn 2005an de 29 hezar deng hatine dan, niha nêzikî 31 hezaran, ango vê carê 2 hezar deng zêdetir hatine bikaranîn) ev hilbijartin nîşanek piştigiriyek xurt a gelê Kurd; jî bo siyaseta Kurdistanî ya PDK-YNK ye. Ez bawer im û me hemûyan bi çavan dît: destdana her dû partiyên me yê mezin ên Başûrê Kurdistanê hêviyên gelê Kurd xurttir dike. Daxwaz: destdana wan di nav hukimetek yekgirtî ya Kurd di demê herî nêzik de ye...

cbatun@yahoo.se

Encamên hibijartinên hinek wîlayetan aşkera bûn



Wêne: Mesrûr Barzanî

BEXDA - Komîsyona Bilind ya Hilbijartinan di preskonferansêkê de encamên neresmî yê hilbijartinên giştî yê li 11 wîlayetan aşkera kir. Li gor van encaman listeya Erebên şîi Hevpeymanîya Iraqê Yekgirtî li pêş e û Hevpeymanîya Kurdistanê jî tenê li bajarên Kurdistanê bi ser ketiye

Li gor Adil El-Lamî encamên hinek wîlayetên Kurdistanê û Bexdayê wiha ne:

Wîlayeta Silêmanî:

Hevpeymanîya Kurdistanê: 671 814

Listeya Neteweyî ya Iraqê / Eyad Ellawî: 1 806

Yekgirtîya Îslamî ya Kurdistanê: 83 208

Partî çareserî Kurdistan: 1 140

Wîlayeta Hêwlêrê:

Hevpeymanîya Kurdistanê: 985 750

Listeya Neteweyî ya Iraqê / Eyad Ellawî: 2 420

Yekgirtîya Îslamî ya Kurdistanê: Ne diyar e

Rafideyn/mesîhî: 1 599

Partiya Karê Kurdistanê: 1

721

Cepheyê Turkmenî: 1 144

Wîlayeta Dihokê:

Hevpeymanîya Kurdistanê: 344 717

Listeya Neteweyî ya Iraqê / Eyad Ellawî: 2 327

Yekgirtîya Îslamî ya Kurdistanê: 28 401

Rafideyn/mesîhî: 4 695

Wîlayeta Kerkûkê

Komîsyona Bilind ya Hilbijartinan encamên neresmî yê wîlayeta Kerkûkê jî aşkera kir û listeya Hevpeymanîya Kurdistanê jî dengên ku heta niha hatine hejmartin li Kerkûkê 266 737 deng wergirt û ew jî dike jî % 51.89-ê dengên wîlayeta Kerkûkê. Listeya didoyê jî bû Cepheyê Iraqê jîbo Diyaloga Wetenî û wê 73 191 deng wergirt ku dike jî % 14.24. Listeya sêyem jî ya Cepheyê Turkmenî yê Iraqê ye û wê 59 716 deng wergirt ku dike jî % 11.62.

Li **Kerkûkê** listeya Erebên sinî bi 31 724 dangan di rêza çarem de ye û listeya Erebên şîi jî bi 18 431

dangan di rêza pêncem de ye.

Li wîlayeta **Mûsilê** jî listeya Hevpeymanîya Kurdistanê di rêza didoyê de ye û heta niho 157 476 deng wergirtiye ku dike jî % 19.20. Listeya Erebên sinî jî di rêza yekê de ye û 302 518 deng wergirtiye ku dike jî % 36.88. Rêxistina Kurdên Êzîdî jî (Tevgera Êzîdîyan jî bo reform û pêşxistinê) bi serê xwe li Mûsilê 18 619 deng wergirtiye.

Wîlayeta Bexdayê:

Hevpeymanîya Iraqê Yekgirtî: 1 430 901

Listeya Neteweyî ya Iraqê / Eyad Ellawî: 327 174

Cepheyê Tewafîqa Iraqî: 451 782

Risaliyûn/Sedr: 44 010

Cepheyê Iraqê bo Diyaloga Nistimanî: 36 670

Hevpeymanîya Kurdistanê: 25 308

Li gor van encamên neresmî dixuye ku wê Kurd di parlamen-toyê de bibin xwedî hêzek baş û meqamên girîng bidestxin.

Malpera Beyan Net ê xelata yekemîn wergirt

PK - Komela Rojnameyên Internetê ya Swêdê (Föreningen för Sveriges nät-tidskrifter /FSN) malpera Beyan Net, a ku jî alî ciwanên Kurd ve hatiye avakirin, hêjayî xelata yekemîn dît.

Di roja 17/12/2005an

de Serokê Beyan Net ê Bawer Coşkun xelat li Stockholmê wergirt.

Em jî wek rojnama Peyama Kurd ciwanên Kurd pîroz dikin û hêvîdarin ku wê ciwanên me dengê Kurdan li cihanê bilindtir û xurttir bikin



Civîna Amedê doza mafê çarenûsî kir

PK - Di 17-18ê meha Çi-leya Pêşîn de li Diyarbekirê bi beşdariya li dorî 250-300 rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd civîna hat lidarxistin. Di civîna ku du rojan dom kir de 46 Kurd axivîn û liser çareserkirina pirsê Kurdî li bakurê Kurdistanê û helwestek netewî de nerînên xwe bi beşdarî û raya giştî ya Kurd re parve kirin.

Civîn jibo raya giştî bi belavkirina encamnameyê de dawî hat.

Ev yekdengî ji aliyê hemû beşdar û raya giştî ya Kurd ve wek nişana biryariya Kurdan ku liser bingehê îradeya netewî û bi hevdu re karbikin hat nixandîn.

Di encamnamê de hat eşkerekirin ku Civîna Yekitiya Netewî ya Demokratîk ya Kurd bi armanca dîtina niqteyên hevbeş û yekitiya siyasî ya Kurd civiyaye. Bi berdehamî encamname bal dikêşe ser şaşî û neheqiyên dîroka dewleta Osmanî û Tirk, siyaseta dewleta Tirk ya "yek dewlet, yek millet, yek zîman" rexne dike û nerazibûna xwe tîne ser zimên û wiha dinivîse, "mafê gelê Kurd heyê ku xwe bi awayekî siyasî, îdarî û yasayî ifade bike." Encamname jibo çareseriyê biryarê ji gelê Kurd bi xwe re dihele û diyar dike ku ev pirs tenê dikare liser bingehê kekhevi bê çareserkirin.

Axivkeran di axaftinên xwe de cîhekî taybet jibo yekitiya siyasî ya Kurdan veqetandin û di vî mijarê de terefîrî û dildariya xwe bi lêv kirin û pêşniyarên xwe bi rêzkirin.

Beşdarên civînê ragihandin ku ji hewldanên heta niha îradeyek siyasî ya netewî derneket û jiber vî yekê eşkere bûye ku tu kes bê ku hemû Kurdên xwedî fikir û siyasatên cuda himbêz neke wê şansa serkeftinê nebîne.

Niqteyek balkêş bû ku ligel niqaş û hizir û ramanên cuda axivkeran ev mijar ji xwe re nekirin asteng. Wan bêtir taybetiyên xwe yê hevbeş-netewî derxistin pêş ku ev ji aliyê beşdar û raya giştî ve tê pesnandin û bawerîya ku wê ev hewldan bi yekitiyek siyasî bi dawî bibe xurt dike. Wek ku di encamnamê de jî hat nivîsandin komîsyona ku ji 39 kesan hat hilbijartin wê jibo programek yekitiyê jî deyne pêşiya xwe.

Şefîka Taşoglu di daxuyaniya xwe ya jibo malpera Dengê Kurdistan de gazind û rexne dike ku di civînê de hejmara beşdarên jin kêm bû. Taşoglu gumana xwe bi lêv dike ku ev kêmasî bê çareserkirin.

Hin beşdar û axivkerên civînê jî nerînên cuda fikir û helwestên xwe ji Peyama Kurd re wiha nixandîn:



Vildan Tanrikulu:

Ev di demek wiha de û li Diyarbekirê lidarxistina civînek wiha gelekî girîng

dibînim. Beşdariya civînê ne bi aîdiyetek îdeolojîk û rêxistinîya bi derekê ve girêdayî lê, her çiqas herkes xwedî aîdiyetekê be jî, bi şexsiyetên serbixwe pêk hat. Herkesekî li wir xwe temsîl kir ku bi ya min ev niqteyek hêjayî pesnandinê ye. Em dikarin bêjin ku hemû meylên siyasî li wir hebûn û xwe temsîl kirin. Ji aliyê din ve ev civîn lêgerîna riyek nû ya jibo yekitiya netewî û îradeyek siyasîye ku ev jî girîngiyek din e. Komîsyonên jibo rêvebirîya kar jî ne bi dengdanekê, bi li dij derketin û piştgiriya hatin hilbijartin. Kê xwe pêşniyar kir û xwest ku vî karî bide ser milê xwe ketin komîsyonan ku ev jî balkêş û girîng bû. Ger ev hewldan ji berjewendiyên teng û nakokiyên şexsî û rêxistinî dîr bê bikaranîn, bê ku mere jî niha ve hêviyên mezin jê bike, potansiyeleke.

Cîhê kêfxweşiyê ku encamnameya civînê bi yekdengî hat qebûl kirin. Encamname divê bikaribe bibe programek berbiçav, divê jibo vî platformê hiqûqekê bê danîn, armancên xebatên eşkere bibe. Bi dîtina niqteyên hevbeş ev gav dikare bibe îradeyek siyasî ya netewî. Û di vî mijarê de ez bi hêvî me û jiber vî jî min kar wergirt.



Siracettin Kirici:

Berî her tiştî ez kêfxweşim ku ev civîn li Amedê çêbû. Siya-

seta Kurdî jî paytext û bajarên Tirk hat navenda welatê me, ev gawek baş e. Ji aliyê din ve ez bi xwe heta niha beşdarî gellek civînên wiha bûme û care yekem dibînim ku bi vî konseptê rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd liser encamnameya civînê bi vî rengî li hevdu dikin. Ev jî hêvî dide min. Di civînê de 46 kes axivîn û herkesî nerînên xwe anîn zimên, hin ji wan federasyon, hin ji wan dewletek serbixwe parastin. Lê encamnameya ku bi yekdengî hat qebûl kirin biryar jî gelê Kurd re hişt û tukesî liser ya xwe israr nekir. Ev cîhê kêfxweşiyê ye. Di civînê de coş û heyecanek hebû. 40 kesî bi dilê xwe xwestin ku di nav grûba xebatê de cîh bigirin û kar bikin. Bi ya min ev jî gawek balkêş û pozîtîf e. Piştî siyaseta entegrasyonê êdî Kurd dixwazin midaxaleyî ve siyasatê bikin.

Li Bakurê Kurdistanê valahiya tevgerê ango mixalefetek Kurd heyê. Ev civîn dikare rê li ber ve xitimandinê jî veke, karê grûba xebatê dikare Kurdan bigihîne damezirandina partiyek sivil û demokratîk ku mafê gelê Kurd yê rewşa bi eşkere tîxe program xwe û li derê biparêze.



Medenî Ayhan:

Ji îro û pê ve şansê tu grûbekê nîne ku rêvebirîya gelê Kurd bike. Encax hevkarî û

yekitiyek Kurdên ji raman û tradîsyonên cuda dikare dinamîzmek nû biafirîne, hêvî bide û girseyan tîxe nav tevgerê bi heyecan. Min di axaftina xwe de jî got ku her Kurdek divê ne bi rêxistin û grûba xwe lê bi şexsiyeta xwe di nav civînê de cîh bistîne. Divê em partiyekê damezirînin ku jibo me hemû

Kurdan re bibe wek siwanekê û em hemû xwe li wir bigirin. Heta ji wê bêtir her perçeyekî Kurdistanê dikare kongreyekê netewî damezirîne û ji herçar kongreyên çar perçeyan konseyek ku hemû Kurdistanê temsîl bike bê afirandin. Ev jiber çî lazime? Hindik maye ku rejîma Sûriyê û Îranê jî ji hevdu bikevin. Dibe ku Peymana Lozanê jî xira bibe û sistema mêtînghekarîyê tîk biçê. Divê li gor van şert û mercan amadekariya xwe bikin.

Divê êdî rîya siyasatê jî nîfşekî nû û ciwan re jî vebe. Bi mejî, mirov û dezgehên kevî tu tiştêk nameşe. Nîfşên kevî jî dikarin tecrube û zanebûnên xwe dewrî nîfşên nû û ciwan bikin. Bi nîfş, dezgeh û siyasatên nû dikare rê liber siyaseta Kurd vebe.

Ligel hemû kêmasiyên xwe û rexnên ez lê dikim civîn gawek baş bû. Ger em pirsgrêkên xwe çareser nekin wê pirsgrêk zora me bibin.



Sebahattin Korkmaz:

Em gelek insanên jî der û dorên cuda beşdarî civînê

bûn û ez jî vî yekê jî gellekî kêfxweşim im. Lê hîn ev gav destpêke, wê çî bibe, emê çawa hînê hevdu bibin, tolere bibin, hevdu hezîm bikin û kulturek pîrî rengî, pîrî dengî di nav xwe de pêk bînin? Bersivên pîrsên wiha di demên pêşiya me de wê zelal bibin. Ez kêfxweşim ku ev civîn li Diyarbekirê pêk hat. Belkî jî beşdarî hin kes çarê yekem hatin Diyarbekir û dîtin. Başê ku ev hewldan ji Kurdistanê destpêkir û wê jî vir bidome û îdare bibe. Heta niha kar û barên Kurdayetî li metropolan, li bajarên Tirkîyê dihat kirin. Êdî di civînê Kurdan de bikaranîna zîmanê Kurdî gawek nû û pêşda ye. Jiber vî yekê civîna Diyarbekirê di cîh de bû û hêvî dikim ku hin encamên baş jî bide ku ev bi xebat û birêvebirîyê ve girêdayî ye.

Ji her terefî gellek kadroyên hêja beşdarî civînê bûn û axivtin. Ger em aliyên xwe yê îdeolojîk dernexin pêş, liser zemîna Kurdayetiyê û bi kulturek demokratîk bimeşin ev tevger di pêşerojê de dikare bibe temsîlek netewî. Bela ku min wiha dît jî niha piştgiriya vî tevgerê dikim û beşdar bûm û min di rêvebiriyê de cîh stend.



İbrahim Guçlu:

Ji pîrî alî em gihiştin encamên pozîtîf. Niha meyîlek wiha çêbûye ku na-

venda siyasî ya Kurd tê Diyarbekirê. Ev jî niqteyek pozîtîf e. Di encama axaftinê de çendek model derket holê. Pêşniyara hin kesan ew bû ku cepheyek ango rêxistînek raser bê damezirandin. Ez jî di nav de hin kes liser wê fikirê ne ku em xebatê bi pêşda bibin, bi çalakiyan pêş bixin û piştî demê girêdayî bi programê jibo rêxistînek Kurdî û Kurdistanî kongreyek demokratîk netewî çêbibe. Rêxistîna netewî liser bingehê du millet û du welat divê programek ku rê liber serxwebûnê jî negire federasyonê biparêze. Terefekî din jî tenê Kurdistanek serbixwe diparast. Jiber vî yekê bê ku navek lê bibe di encamnameyê de mafê çarenûsî hat nivîsandin. Her wiha em gihiştin wê encamê ku xebat liser xebata hiqûqa şexsî bimeşe. Jiber ku li hin deran ev tevger wek koalîsyona tevgeran hat nixandîn û famkirin. Navenda xebata me wê Diyarbekir be. Em jî wek hemû milletên dinyê milletek in û divê di statuyek wek hev xwediyê maf be û ji aliyê civakî, aborî, soyasî û hiqûqî ve desthilatdar be. Liser axa xwe xwe bi xwe îdare bike.



Bâýram Bozgel:

Ev civîna li Diyarbekirê dewama civîna Anqerê ye ku di 4ê Îlonê de civiya bû. Civîna

Anqerê piştî axaftina Erdogan ku li Amedê gotibû, "pîrsê Kurdî heyê" bi bêhazirî û bi awayekî spontane çêbûbû. Loma encam û beşdariya wê civînê ne bi dilê me bû. Lê civîna Diyarbekirê encama xebata komîsyonê bû û em bi amadekariya beşdar bûn. Ez bi fikarim ku her fikirên li bakur hene beşdarî civînê bûn, xwe temsîl û ifade kirin.

Lê balkêş bû ku ligel jî federasyonê heta dewletek serbixwe fikirên cûr bi cûr encamnameya civînê bi biryara mafê çarenûsî derket û bi yek dengî hat qebûl kirin. Ez heta niha beşdarî gellekî civînên wiha bûme, lê care yekeme ku tiştêk wiha dibînim. Bêguman di pêvajoya kar de wê nerîn û xwestikên me jî zelaltir bibe.

Ez hêvîdarim ku guherandinên li herêmê bûye û dibe jî wê bandorek pozîtîf liser vî tevgerê bike. Gava herkes di kozîka xwe de bimîne wê tukesî dengê xwe negihîne tukesî û tu derê. Niha azadî jî her demê bêtir nêzîke ku ev jî mirov bêtir nêzîkî hevdu dike.

■■■

biravetî

Bayram Ayaz



Wênaya tevgera bakur, civîna Amedê û riya rast

Li bakurê welatê me siyasetvan û rewşenbîr derbarê pirsên tevgera welatparêza Kurdistanê de di nav lêgerîn û vekolînek balkêş de ne. Ev hewlêdan bi çend şeweyan berdewam in.

Yek ji van xebatan „Civîna yekîtîya netewî demokrat a Kurd“ e ku dawîya heftiya berê rojên 17 û 18ê çilavê pêşin li Amedê pêkhat. Ev civîna duyemîn bû. Civîna yekemîn roja 4ê îlonê li Enqerêyê çebûbû. Di civîna Amedê de zêdetirî 200 kesayet amade bûne. Ev civîna rojê xwe bi mijarên siyasî balkêş ve dagirtî bûye. Profîla siyasî û mustewa bîrewerîya civîna ji baş bûye. Em piraniya beşdarên nasdikin. Gelekên wan kadroyên salên heftiyê û heştîyê ne, çend rûspiyên me jî tevî civîna bûne. Armançên ku ve grûbê daye pêş xwe, motifên hin axaftinan û daxuyanîya civîna cihê keyfxweşiyê ye.

Heftiyek berî ve civîna ji rojên 10 û 11 an bi qasî 75 kesayeten ku ji salên 70î û virde di nav refên grûba Rizgarî û Ala Rizgarîyê de xizmeta doza Kurdistanê kirine, lihev civiyan. Wan hem hevaltî û dostaniya xwe teze kirine, hem jî bîr û baweriyên xwe ji hev re diyar kirine. Ev jî civîna duyemîn ya van xuş û birayan e. Vê grûbê jî armançên hevdiîtinê xwe bi deh xalan diyar kirin. Ew jî li xebatek, mejî û programek netewî Kurdistanî û hevbeş digerin. Gelek kesên ku di vî civîna de amade bûbûn, beşdarên civîna Amedê jî bûn. Navên wan li wê derê jî derbas dibû.

Berî mehêkî jî gelek kesayeten kurdperwer ji dorberên grûba Kawa yê berê bi munesebeta 27 saliya şehidkirina Ferîd Uzun berê xwe dan Siweregê, li wê derê hevdu ditin. Ev jî lêgerîneke.

Wekî em dibihîsin û dibinin, gelek kesayeten ku iro temenê wan jî pêncî derbaz bûye û hinek jî wan nêzikayî li salên şeştî dikin, bi wan re di vî qunaxa em tê de muhasebeyek wijdanî jî destpêkiriye. Ev jî rûdan û diyardeyekî pozîtîfê.

Ji aliyê din ve hin kesayeten ku di nav civata Kurd de xwedî giraniyek in, lê kar dikin ku ew jî di hêla xwe de partiyek bi xetek Kurdewar damezirînin. Bîrê Şerafettin Elçî, Dr. M. Emin Sever, Derwêşê Sado, M. Ali Eren, İbrahim Aksoy û hin kesayeten din jî di nav hewlêdanek wisa de ne.

Li ser mîratê DEP-HADEP-DEHAPê jî berhevdanek balkêş heye û berdewam e. Li wê derê destê hinekan jî hêza xelkê ku hêj dora wê xetê ne nabe, hinekî din jî fen û fûtan digerin, gelo çawa wî mîletî bikin Tirkiyeyî. Tiştê li wê derê diqewime, ew jî tofaneke din e ku bi ser mîletê me yê bakurê Kurdistanê re hatiye. Bêguman dem hatiye ku em divê riyek bibînin daku em bikarin vî xelkê xwe jî wê tofanê rizgar bikin.

Ev tiştên me pêşkêş kirin wênaya tevgera welatparêza bakurê Kurdistanê derdixê pêş me.

Tevgera bakur li ser hev nine, ji rêxistînek û pêşkêşiyek xwedî otorîte bêpar e. Bi sedan kadroyên welatparêz di nav lêgerînek de ne. Programek netewî hevbeş hêj nehatiye diyarkirin.

Tiştê pozîtîf çiyê? Hemî derdorên welatparêz ve rastiye kêr zêde dibînin û eger hêj bi temamî li xwe neyên mikurê jî, vî rastiye qebûl jî dikin. Mîrov jî devê gelek kesan dibihîse, dibêjin: „Em li aqilek muştêrek digerin û dixwazin li dora bîrewerî û programek Kurdistanî bicivin“. Hemî kes piştevaniya başurê Kurdistanê wek erkek netewî dinirxîne û doza Kurd û Kurdistanê, kêşeyek rewşa û mafê çarenivîsa gelê Kurdistanê bi navdike. Federasyoneke ser bîngê wêlatan, wekhevîya siyasî û hevî jîyanêka aruzemendî û aşitiyane wek çareseriyek demokrat pêşkêş dikin. Ev çarçove dikare jî bo bakurê welatê me jî bibe çareserî û sedemê pêkhatina aqil û programa muştêrek û zemîna partiyeka hevbeş fereh. Kurd divê şiyar bin û riya xwe jî doza welat, al, dewlet û desthilatê şaş nekin. Divê em bixwe bawer bin û bi derengî nekevin.

Miletekî ne ecêb!

Di hejmarê 67 ya rojnameya Peyama Kurd ya heftiya derbazbûyî, di goşenivîsa xwe ya berdewam ya bi navê ‘panorama’ de, bîrayê hêja Dilbixwîn Dara gotarek bi navê Miletekî ecêb nivîsandibû û têda behsa reftarên Kurdistanîyên başûrî kiri bû ku bi sema, Dehol û Zirne ve diçûn helbijardinan. Herwusa di nivîsa xwe de diyarkir ku ev helwesta Kurdistanîyan jîbo wî û xelkê biyanî jî tiştê ecêb bû, jiber ku ev yekemîn care mirov bi vî awayî diçûn ser sindoqên dengdanê.

Li vir ez dixwazim ji kekê Dilbixwîn re bîbêjim ku ew ne tiştê ecêb e û ne yekemîn care jî diqewime, belkî her mirovekî ku biserdikeve kêf û semayê dike, helbet her yek jî bi şeweyê xwe kêfa xwe nîşan dide, hin kes li rojava şampanyayê belav dikin, li welatekî mîna Brazîlya jî semaya

bi navê ‘Samba’ dikin, li Mîsrê jî bi semaya ‘Ela wehde û nus’ kêfa xwe nîşan didin, Kurdistanî jî bi Dehol û Zirneyê kêfa xwe bi serketinê nîşan didin. Belkî kekê nivîskar û xwendevan jî bîbêjin; mane beriya derketina encamên helbijardinan û berî ku Kurdistanî bizanin ka ew biserketin yan ne, wan dilan û sema dikirin. Lê ez dibêjim mesele wesa nîne û Kurdistanîyan beriya serketinê şahî nekirine, lê piştî encam derketin û serketina wan hatî ragihandin wan govend girêda! Û jîbo ku gotina min ya zelal be, ezê bêjim;

Bi dirêjîya dîroka xwe miletê Kurd jîbo demokrasî, wekhevî û azadiyê xebat kiriye û dike, di vî rêyê de bi sed hizaran qurbanî û şehîd dane



Silêmanê Alîxan

bikim û beriya hemûyan şoreşa Îlonê ku mezinîtin şoreş bû, ne tenê li başûr belku li hemû Kurdistanê. Dirûşma ve şoreşê ya serekî ‘demokrasî’ bû, herwusa şoreşa Gulanê jî ev dirûşim bilind kiribû, piştî serhildana buhara 1991ê jî her demokrasî bû dirûşma Kurdistanîyên li başûr, piştî ketina senemê Sedam jî beriya du salan daxwaziyên Kurdistanîyan her ew bû û jîbo çêbîckirina ve demokrasîyê Kurdistanîyan xebat û zehmetek mezin kêşa digel aliyên din û bi taybetî erebên ku dixwazin bi yasaya xwe Îraqê


û hêjî didin. Jiber ku mijara me liser başûrê Kurdistanê ye, ezê behsa şoreş û serhildanê wê beşê

û Kurdistanê bi rêvebin. Yasaya wan jî wek em hemû dibînin kuştin, serbirîn û talankirine, ‘wate yasaya daristanê’ ye.

Lê li dawiyê rêbaza Kurdistanîyan biserket û di destûra bîngêhîna Îraqê de demokrasî bi cî bû û bi navê Îraqê ye hat girêdan ‘Îraqa demokratîk û fedral’. Helbijardî jî stûneke serekî û nîşana demokrasîyê ne, loma dema helbijardî hatin encamdan wate serkeftina hizr, bîr û rêbaza Kurdistanîyan hate ragihandin. İca Kurdistanîyan sema û dilan girêdan. Encamên helbijardînan jî çawa bin ew meseleyek dîne, lê giring rêbaza Kurdistanîyan biserket û xebat û qurbanîdana wan bi belaşî neçûn, İca ez bêjim em ne miletekî ecêb in’ kekê Dilbixwîn.

silemani_alixani@yahoo.com

Keremê Seyad Xelata Rêzgirtinê wergirt



Keremê Seyad:

“Di sala 1958an de nemir Barzanî hate Ermenistanê û serdana radyoya me kir”.

PK/ Xebat - Wezaretê Rewşenbîrî ya Herêma Kurdistanê Xelata Rêzgirtinê da birêvebirê radyoya Yêrîvanê-beşê Kurdî Keremê Seyad.

Keremê Seyad bi dirêjîya 45 salan, di radyoya Yêrîvanê de xizmet kiriye.

Ew di sala 1938 de li gundê Mekoyî li navçeya Talîn jî dayîk bûye.

Wezîrê Rewşenbîrî Samî Şoreş di dema dayîna xelatê de got: “Cihê Radyoya Kurdî

li Yêrîvanê di nava medyaya Kurdî de cihêkî berz û bilind e, cihêkî taybet e. Keremê Seyad nêzikî 50 salî di wê radyoyê de xebitî ye... cihê rêzgirtinê ye”.

Keremê Seyad jî ji aliyê xwe ve behsa serdana nemir Mele Mistefa Barzanî jî bo radyoya Yêrîvanê kir û got: “Di sala 1958an de nemir Barzanî hate Ermenistanê û serdana radyoya me kir”.

Êrîşên liser malperên Kurdistanî berdewam in

Dewleta Tirk bi her awayî li hemberî Kurdan şerê xwe didomîne. Beşekî vî şerî jî di warê çapemeniyê de ye. Ji derveyî cezadayîna rojnamevan û nivîskar, qedexekirina kovar û pirtûkan, di dinyaya-sanal de jî êrîşê fîbe ser Kurdan.

Bi saya internetê êdî bi rastî dinya piçûk bûye. Internet sinoran nas nake, lê dîsa jî dewleta Tirk bi hemû imkanên xwe dixwaze derî li ber agahdarbûna Kurdan bigre. Li Tirkiyê di internet cafeyan de vekirina malperên Kurdan hatine qedexekirin. Li derveyî welêt jî malperên Kurdan bi destê hêzên dewletê tên haker kirin. Heta nika malperên Kurdan ên ku nehatiye hakerkirin nine.

Hefta bihurî malpera **PDK-Bakur** dîsa hat haker kirin. Gava mirov malper vedikir resmek dadiket ekranê.

Bi qasî 5-6 rambo bi çekên terminator, çekên xwe nîşan dikirin, wek ku êrîş dibin ser berateyekî (cendekekî) û liser cihê nîşankirî bi herfên mezin “DARBE” nivîsandibûn. Ev êrîş birin 2-3 caran ajot, lê ne hemû rojê. Her rojê çend carî bi qasî niv sehet- sehetekê ajot.

KÊFXWEŞÎ Û XEMGÎNÎ

Çeto Omerî

Carna dilê mirov ewgasi şad û bextewar dibe ku gotin ji tere nake, de ka çawa mirov bikaribe hestên xwe bine zimên. Gava hestên mirov wek hespekî rewan radibe repinekê, destgîn çiqas li gor bawerî di destê dilan be ji ew repinek bê westane. Îcarê hestên dilê mirov ku bi serxweşî bûye siwarê hespê rewan. Pêre repîndare, bi dilekî evîndar û zarokane ji felekê qebû dixwaze. Wek hercar tete gotin ma ji xeynî zencîrên zendê me tiştek heye ku emê wenda bikin? Belê îroj hindik be ji azadiyek heye, biçûk be ji beşek ji welatê me rizgar bûye û dibe nişana demokrasîyê li rojhelata navîn.. Êêêêê de bipîrsê Cigerxwînê cêgerê dilê min, pîrsa xwe bike de em kine û were liser serê min rûne, ezê bixwînim ji diwana te;

-Emin ew gela belê emin ejderha.

-Ji xewa mirî hisyar bûn niha û pistre gava min xwe negirt û ez kelogirî bûm tu li min bibore seydayê mij,

ew giri dê ji kêfa dilê beh-tewar be. Jiber ku sêsed sal berê Ehmedê Xanê mezin bi hestên Kurdîniyê û bi çawên zanyarî tiştan ditiye û ji me re peyxam şandîye. Xwestekên wî hebûn, xwezîya xwe bi gotinên zêrin di helbestên xwe de neqîşandîye.

...Lew pêkve hemêşe bêtişfaq in

...Daîm bi temerrud û şîraq in

...Ger dê hebûya me it-tîfaqek

...Vêkra bikira me inqîya-dek

...Rom û Ereb û Ecem te-mamî

...Hemîyan ji me ra dikirin xulamî"

Belê îroj Mam Celal Serokkomarê Iraqê ye, kes jê rê xulamîyê nake lê ew Serokatiya Ereban ji dike. Kak Mesûd Yekem Serokê Kurdistanêye ku bi hilbijartina parlemena Kurdî bûye serok. De îcarê çawa hestên mirovan yê niştimanperweriyê rane-be repîne? Jiber ku gellek karmendên Tirkan tèn û li Kurdistanê azad kar dikin, ji Kurdan re rêyan çêdikin,

balafirgeh û xaniyên bilind ava dikin û van karê xwe di bin sîya ala rengin de di-kirin.

Îcarê hezar û sed hezar rehmet li gora Ahmedê Xanî be ku berî niha sêsed salan girîngiya yekîtîyê anîye zimên. Piştî ku herdu partiyên sereke yên

Kurdîstana başûr dest bi xebata yekgirtî kirin, gellek pêşveçûnên girîng ji pêkanîn. Îcarê niha li pêşîya van xebatên gellek mezin-girîng yên dirokî hene. Weke yekgirtina parlemena Kurdî, artêşek netewî, el-fabêta Kurdî û bi rêya hilbijartinan damezirandina hikûmeta Kurdî ûhw.


Herdu serokên Kurdî ji xwedî dirokek şervanî (pêşmergeyatî) û sîyasî ne.

Qada navnetewî dinasin û tene naskirin. Dikarin rolên xweyên dirokî liser hemû beşên Kurdistanê bilizin. Di nava ewgas bûyerên pozîtîf de mirov bûyerên Dihokê dibîzê û hêrs dibe. Jiber ku em neviyên Selhadîne Eyyûbî ne, em neviyên Saidî Kurdî ne, yên Şêx Ebdilqadirê Geylanî ne, neviyên Melayê Cîzîrî,

Şêx Ehmedê Xanî ne. Bav û kalên me misilmanên bi bawerî bûne û di rêya misilmanîyê de jibona ummeta misilmanan gelek kar û xebatên mezin kirine.

Bawerîya van jibo berjewendiyên şexsî nebûye, bawerîyek ji dil bûye, jibona xudayê mezin û ola islamê çî ji destên van hatibe teksîr nekirine. Ma bedela van kar û xebatan, ma bedela van baweriyên pak û dilên hezkirî erîşên teroristî ne? Car carna liser van bûyeran ez jixwe re difikirim û dibêjim Kurdan bi rêya zilm û zorê mecbûr mane ku ola islamê qebûl kirine. Ez bawerim ku netewayê ku herî talî dev ji islamê berde wê dîsa Kurd bin. Jiber vê bûyerên li Dihokê bûyerên dilêş in û ne di berjewendîya milletê Kurd dene.

Di nava ewgas fikir û raman de dîsa jî gava dengê ku bi zîmanê zikmakî ji aliyê welatê abadî ve, bi bayê hênîk bê û li rûyê meriv bixê û bi xwe re dengê şalûl û bilbilan, û qepqepa kewê gozel ji mere bîghî-ne, herçiqas xemgînî hebe ji dîsa dil liser hespê rewan de repîndare...



Kadîm Kan

Di Şanoya Tirkan de Kurdên Tirkofil

Gava kufere kevî Tansu Çiller di sala 2000an de digot "Eger rojekê A. Öcalan di parlamentoyê de di navbera me de (Tirkan de) wek parlamenter rûnişt, şaş nemînin" gelek ev gotina wê, yek ji gotinên wê yê vîngî vala dihesibandin.

Vêca wexta meriv li pêvajoya ji sala 2000an û virde mîze dîke dibîne ku perda peşin ya şanoya „Kurdên Tirkofil“ „Komara Demokratîk a Tirkan“ hêdi, hêdi diqede û perda „Kemalistên Kurd ji nû ve dewleta Tirk ava dikin“ destpêdike.

Di pey bûyerên Şemzînan de pêwîstiya dewletê bi dengê ku Kurdan sakîn, bêdeng bike, naveroka meş û xwestinên ku li Kurdistanê dihatin kirinê vala bike, hebû. Jiber wê jî bi carekê hewa li derdora Îmralî xweş bû û motara keştiya ku pê diçin û tèn dest bi kar kir û daxuyanîyên wî bi carekê bi pelên rojnaman ketin.

Ez dibêim qey bala we jî dikşine ku êdi gellek rojnamevanên Tirkan jibona Öcalan nabêjin „serokê teroristan“ û „mêrkuj“.

Gelek rojnamevanên Tirkan di derbarê wî de telefûza xwe gewirandine. Dibêin „apo“ yan jî A. Öcalan. Di bawerîya min de, çiqas Kurdên welatparêz bêtîrs ditînin xwe bi zelalî dibêjin û Kurdên ku dewlet ji wan memnûn nîne zêde dibin, agir bi devîngê dewleta kîr dikeve.

Wek tê xuyakirin Tirk alternativekê ji nava Kurdan li himber Kurdan derdixin û weha xuyaye ku wê di nêzik de alternatîva xwe resmî jî îlan bikin û muxatab bigrin.

Tirk behsa siyasetek nû dikin. Di ber de jî tê nîşankirin ku qaşo di navbera Artêşa Tirk, Serokkomar û Serokwezîr de liser Kurdan dubendî heye. Kaşo wê Serokwezîre Tirkan yê demokrat ji heq û hiqûqê Kurdan re rêz nişan bide, wê Kurd û Tirk wek li bihuşta xuda bi hevdu re bi biratî bijin.

Li ser ruyê cihanê cihekî weha tune ye û ez ne bawerim ku kesên Aqlêselîm dixwazin li hêviya bihişta derewîn jî bisekinin.

Tirk û Kurden Kemalist dixwazin bi rêya „Demokratîk Cumhuriyet“, nasnama „jorîn û ya jêrîn“ bi dimenek menzereyek illûstîonî hêviyên tewş û belasebeb bidin Kurdan. Bi çîroka dewleta uniter û demokratîk ku yek dewlet, yek bayrak û yek netewê ye, bi xeyal û hêviyên utopîk Kurdan bixapînin.

Di şanoya ku tê leyîstandin de nivîskar, rejîsor, leyîztnivîs, lîztikvan û seqşeqcî di paş perdeyê de jî yek merkezi ve tê îdarekirin.

Lê mixabin Kurden welatparêz û Kurdewar ku bedelên nedîtî dane, hîn ne xwedîyê stratejîyek, siyasetek hewbeş ya netewî ne ku karibin derkevin qada navbera Tirk - Kurden Tirkofil û netewa Kurd. Jibona stratejîyek Kurdîstanî niqta ku meriv wê jê birêkeve, yanî xêza startê gerek vekirî û zelal binavkirina pîrgîreka me be.

Tiştên konkret-berbiçav hene ku Kurdên ne Kemalist nikarin dev jê berdin; Kurdistan welateke û Kurd xwedîyê wî ne.

Xwedîyê Kurdistanê dixwazin li gor hiqûqa navnetewî, yan wek dewletek yan jî wek fêderasyonêk xwedîyê welatê xwe bimînin û NE TIŞTEKÎ DIN.

Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî: Ez bangî Kurdên bakur dikim ku bi hikûmetê re bikevin diyalogek pozîtîv!

PK - Rojnameya 'el-musteqbel' a Lubnanî, di hejmarê xwe ya roja 17/12/2005 de, hevpeyvînek bi Serokê Kurdistanê re kiribû. Liser meseleya guhertina destûra bingehîna Iraqê, Serokê Kurdistanê got; 'Babeta federalîzmê bi dawî hatiye û rewşa Kurdistanê ne qabilî niqaşê ye, meseleya Kerkûkê jî bi gorey destûra bingehî, ta dawîya 2007 bi dawî tê û Kerkûk jibo Kurdistanê vedigere'.

Di derbareya wan nûçeyên ku dibêjin hêzên Îsrailî rahênanan bi Pêşmergeyê Kurdistanê dikin, got; 'Îsrailî li Kurdistanê tunenê û pêwîstiya Pêşmergeyê jî bi rahênanê nîne. Dîsan got; 'Pêşmerge dikare rahênanê bi xelkê bike. Her li ser meseleya peywendiyên bi Îsrailî re got; 'Em niha beşekin ji Iraqê, îca eger dewleta Iraqê biryar da ew peywendîyan digel Îsrailî girêbide, emê qunsulxaneyê Îsrailî



li Hewlêrê vekin û her kesê bixwaze jî emê dawetî ahenga vekirina qunsulxaneyê bikin'

Di derbareya kartêkirina ezmûna başûrê Kurdistanê liser dewletên derdor, Serokê Kurdistanê got; 'Ez dixwazim birayên me yên Ereb, Tirk, Faris û gelên herêmê fêmbikin ku Kurd nehatine vê deverê, belkî ew xelkên


resenên vê herêmê ne û mafê wan heye ew jî wekî hemû neteweyan çarenivîsa xwe biryar bidin. Her li dor vê mijarê got; 'Her dewleta ku Kurd têda hene, taybetmendîya xwe heye, herwusa Kurdan jî li her dewletekê taybetmendîya xwe heye û em jî hewil didin ku em di 'waqîf' bin.'

Di derbareya helwestên

Serokwezîrê Tirkîyê yên ve dawiyê ku îtiraf bi hebûna kêşeya Kurdî kiriye, Serokê Kurdistanê got; 'Helwestên wî pozîtîv û girîng in û ez bangî Kurdên bakur dikim ku ew dev ji şewazên îstifazî û çekdarî berdin û bi hikûmetê re dest bi diyalogek pozîtîv bikin, em jî amade ne di wî warî de alîkariyê bikin.'

nirxandin

Ömer ÖZMEN



Dewleta kûr rim liser Orhan Pamuk hejand

„Şah, bi qesta kuştina min rim hejand, min got sebep
Da me çêsmê qahr û xîsmê, rim di dil de got edep”

Hozanê Kurd yê navdar Melayê Cizîrî; nakokîya di navbeyna edebiyatê û diktatoran de, bi vî awayê tine zimên.

Diktatorî; jibo dahatîya xwe; pêdivî bi zilmê, zordariyê, neheqîyê, bêehlaqîyê û tarîtiyê dibîne

Edebiyat û huner jî, di pêvajoya pêşveçûna mirovahîyê de; jibo berdewamiya geşbûna xwe; pêdivî bi fikr û ramanên azad dibînin. Jibo ku; di nav civatê de dijîn, pergal û hacetên berhemên wan, jî jiyana civatan tén hîlbijartin. Dema bi fikr û ramanên azad, berhemên hunermend û hozanan tén afirandin. wênayên jiyana civatê derdikeve holê. Rê liber civatê rohnî dibin. Sedemên zilm û zordariyan, paşdemayîn û neheqîyan, tarîbûn û bêehlaqîyan jî terefê civatan de tén lêpirskirin. Civat şiyar dibin û li dij diktator û zilimkaran radiwestin. Bi vî awayî, xof û tirs dikeve dilê diktator û zilimkaran.

Ji şiyarbûna civatan, edebiyatzan û hunermendan berpîrsiyar dibînin. Edebiyata di dilê hunermend û hozanan de ye dibin sedemên qehr û xîşma diktatoran. Jibo wê rimên xwe, tim liser wan dihejin.

Çawa di destnîşankirina ola Zerduştî de “başî û xirabî” bi hevdu re dijîn, di pêvajoya dîroka mirovahîyê de jî, edebiyatzan û zilimkar, bi hevdu re jiyane. Yekî başî, rindî û ronahî temsîl kiriye, yê din xirabî û tarîti temsîl kiriye. Başî, rindî û ronahî, li Kurdistanê Melayê Cizîrî, li Şîlî yê, Viktor Jahra, li Cezayîrê Henri Alleg, li Rûsya Aleksandr Soljenitzîn û Yuri Sakharof, li Tirkîyê, wek sedan kes Orhan Pamuk bûne.

Ne bi tenê Orhan Pamuk, jî damezrandina Komara Tirk û vir de, bi hezaran nivîskar, edebiyatzan û hunermend, an jiyana xwe, di girtîgeh û zindanan de derbas kirine. An jî, jî terefê dewleta kûr ve hatine kuştin. Ji vana çend kes. Ali Kemal, Nazîm Hikmet, Sebahattin Ali, Hesen Izzeddin Dinamo, Kemal Tahir, Yasar Kemal, Edip Karahan Fakir

Baykurt, Yılmaz Güney, Musa Anter, Yaşar Kaya, Nevzat Çelik ywd.

Orhan Pamuk, di qada navnetewî de, kesekî naskirî ye. Romanên wî, nêzîkahtî bi 50 zimanî hatine weşandin. Berendamê şabaşa Nobelê ye. Di xurtkirin û danaskirina zimanê Tirkî de xizmetek giranbûha jî kiriye. Jibo ku, di warê komkujîya Ermenîyan û Kurdan de wek îdeolojîya fermî nafikire, jî terefê dewleta kûr ve hatiye afarozkirin. Ji aliyê dewleta kûr ve bi çalakîyên linçkirinê ve rû bi rû maye.

Romanek birêz Orhan Pamuk, ya bi navê “Benim adım Kirmizi” di sala 2002 an de, jî terefê birêz Mistefa Aydoğan ve vegerîya zimanê Kurdî. Weşanxana Doz ê, ev romana hêja, bi navê “Navê Min Sor e” weşand û jî xwendevanên Kurd re, da qezenckirin. Birêz Pamuk, jibo vegeandina zimanê Kurdî, jî Dozê, mafê telifê jî daxwaz nekir.

Di darizandina Orhan Pamuk ya Stenbolê de, organizasyona barbarîya dewleta kûr, cudareng bû. Parlamenter û rojnamevanên Ewropî jî hatin lêdan. Ji Teşkilata Mahsusa û vir de, aktorekî keftar yê Gladîyoya Tirk Altemur Kiliç, bi navê rojnamevanîyê, serkêşîya çalakîyên linçkirinê didomand.

Jibo darizandina Pamuk, hin Humanîterên Ewropî, digotin “Tirkîyê tê darizandin.” Li gor bir û raya min ev tespît, tenê aliyek dozê ye. Naveroka dozê; pîrsgirêka Kurd û Komkujîya Ermenîyan e. Orhan Pamuk, jibo destnîşankirina vê babetê tê darizandin. Tespîta rast ewe ku, li hember cihana nûjen, di sexsê Orhan Pamuk de, mirovahi tê darzandin.

Zeyneb Hemreş Reşo:

Ez Kolikê bi malê dinyayê tevî nadim, jiber Hemreş li wir raketîye



Ev gotinên jorîn, li gel rondikên çavan jî devê Zeyneb Xanimê derdikevin. Hevalê jiyana wê, bavê zarokên wê û mirovê ku wê jî herkesî bêtir jê hezkirîye, xweşî û nexweşîya jiyane li gel parvekiriye, hevjinê wê Hemreş Reşo li Kolikê (Kahta) hatiye dinyayê û piştî ku ew çûye ser dilovaniya xwe, careke din li Kolikê vegerîyaye.

Di wê pêvajoya hatin û vegeerê de, Zeyneb Xanim 17 salên jiyane li gel siyasetmedar û rewşenbîrê Kurd Hemreş Reşo derbas kirine. Di sêyemîn salvegera mirina Hemreş de em çûn serdana Zeyneb Xanim û me pîrsa Hemreşê Kurd jî

wê kir. Lê berî ku em dest bi axaftinê bikin, min hinekî çavên xwe li derdorê gerandin. Zeyneb Xanimê piştî Hemreş jiyana daye cemidandin. Ji bo wê hîna jî sal sala 2002an e. Tarîxa salnameya li ser maseya Hemreş Reşo 2002 ye. Qutika cixareyên wî, telefona wî ya desta û deftera wî ya têbiniyan hîna li cihê xwe yê berê ne. Li wê malê bi tenê tiştek hatiye guhertin; li şûna Hemreş bixwe, wênayên wî hatine danîn. Keça malê ya mezin Germîn jî xwestîye valabûna ku piştî bavê wê di jiyana wê de çêbûye, bi wênayan dagire. Lê wêne bê hest û bê ziman in... Ez meraq dikim gelo siyaset-

Hemreş Reşo di serpêhati û biranînên xwe yê nivco de, xwe wiha dide naskirin, “Ez roja 11.02.1939an li gundê Saqo yê girêdayî Kolikê hatime dinyayê. Kolik (Kahta) girêdayî Semsûrê ye. Ez jî binemala Mîr Mihemmed û neviyê serokê eşîra Reşûyan (Reşwan) Hecî Bedir Axa me”.

Wî dibistana bingehîn û navîn li Kolikê xwendî ye. Piştî derbasî Kayseriyê bûye û di American College de xwendina xwe domandiye. Dibistana bilind li Stenbolê û Hiqûq jî li Enqerê xwendî ye. Ew di sala 1963an de hatiye Almanya û li Zanîngeha Berlinê ya Azad, zanista Aborî-siyasî xwendî ye.

Hemreş Reşo li kêleka siyasetê, xebateke b i nirx jî bo ziman û edebiyata Kurdî jî kiriye. Wî jî sala 1963 ta 1965an Kovara “Hêviya Welêt” derxistiye. Ji sala 1965 ta 1970î Kovara “Çiya” û jî sala 1983 ta 1989an Kovara “Dengê Yekitiyê” derxistiye.



medarekî mîna Hemreş Reşo ji bo çi serpehatî û bîranînên xwe nenivîsandine? Zeyneb Xanim diçe ji odeya xebatê dosyayeke mezin tîne û datîne ser masê. Ez rûpela yekemîn vedikim û rastî vê hevokê tîm:

"Bîranîn û Serpehatiyên min Ji ber ku salên min êdî 60î derbas bûn, dûçari gelek nexweşiyên mirovkuj bûm û hîn ku serwext im, berî ku dereng bibe, baştir dibînim di niha de 01.07.2000 hêdî hêdî dest bi nivîsandina bîranîn û serpehatiyên xwe bikim". Lê wî derfet nedîtiye ku bibe serî. Cara yekemîn wî roja 13.06.1994an dest bi nivîsandina bîranînên xwe kiriye lê nexweşiyê rê li ber girtiye. Di sala 2000î de jî wî destpê kiriye lê dîsa temam nekiriye. Ez devê dosyayê digrim û pîrsa xwe ya yekemîn ji Zeyneb Xanim dikim:

Peyama Kurd: Hemreş Reşo, ji bo teyger û siyaseta Kurdî mirovekî mezin û giranbûha bû, gelo ew di çavê Zeyneb Xanim de mirovekî çawa bû?

Zeyneb Hemreş Reşo: Berî hertiştî ew heval bû û hevalekî pir baş bû. Dîlfereh bû, henûn bû, dilgerm bû. Qedir û qîmetekî mezin dida min û eşên min. Zarokên me hersî li ser hev çêbûn û mala me tucaran ji mêvanan xalî nedibû. Ez pir diwestiyam, lê wî hêzeke mezin dida min. Ez bawer nakim kesek weke wî bikaribe ji xanima xwe hez bike. Dema bidîta ez hinekî aciz im, yekser dihat li ber dilê min dida, kilam digotin, henek dikirin û ez şa dikirim. Di nava hewqas kar û xebata siyasî de jî wî tucaran dilê min û zarokan nedihîşt û herdemê jî bo me amade bû. Wî nedihîşt ku hisretek di dilê me de bimîne. Eger jê bihata wê stêrkên ezmanan jî pêşkêşî me bikira. Dilê wî pir dewlemend bû.

We cara yekem hev li ku dît?

Di sala 1988an de ew jî bo çûna Kurdistanê hatibû Sûriyê. Pêwendiyên wî li gel mala Şahîn Begê hebûn. Em û mala Şahîn Begê jî bi riya jinan digihên hev. Me bi navbênkariya wan hev nas kir. Wê demê jî dayika min çûbû rehmetê û min li xwişk û birayên xwe dinerî. Di destpêkê de min nexwest ku ez bizewicim, herim xurbetê û dûrî xwişk û birayên xwe kevim. Lê piştî Hemreş çû Kurdistanê û vegeriya min jî biryara xwe da. Tê bîra min wê demê axaftina wî bandoreke mezin li min kir. Ji min re got ku ew mirovekî siyasîmedar e, pêwîste deriyê mala wî jî bo herkesî vekirî be. Wî got ku jiyana wî dikare herdemê tekeve talûkê. Kuştin, girtin û hertişt li pêşiyê ye û lazime ez bidim ber çavên xwe. Wî behsa xanima xwe ya Alman û herdu keçên xwe jî kir. Ew jî hev cuda bûbûn, lê pêwendiyên wan baş

bûn. Wî got ku di aliyê aborî de jî tişteki wî tune ye, lê ewê tucaran nehêle ez muhtacî kesekî bibim. Ev gotina wî jî bo min beramberî malê dinyayê tevî bû. Min biryara xwe da û ez qet poşman nebûm.

Kurdistanê di serê Kekê Hemreş de Kurdîstaneke çawa bû?

Kurdîstana di serê wî de, yeke federal bû. Wî hez dikir her beşek bigihîje mafê xwe yê çarenûsî û idara xwe bixwe bike. Wî herdemê digot, "Em vê xebatê dikin, ji bo ku sibe zarokên me jî wê êşa ku me dîtiye, nebînin". Wî jî şer hez nedikir û piştgirê çareseriyê siyasî bû. Însan jî bo wî nirxê mezin bû. Dema bidîta ku kurdek ketiye tengasiyê, nas bikira nas nekira destê alikariyê dirêjî wan dikir. Pêwendiyên wî bi herkesî re hebûn. Kî û nîfrin pê re tune bû. Dilê wî gelekî pak bû.

Hemreş Reşo, dema ku li malê bi tenê dima, nasnameya siyasî ya resmî dida aliyekî yan ew her siyasîmedar bû?

Ew li malê jî û li derve jî mirovekî germ bû, rûliken bû. Ji resmîyetê hez nedikir û tu sinor di navbera xwe û mirovan de danetanîn. Li gel zarokan zarok û li gel mezinan jî mezin bû. Kîlameke xweş di televizyonê de derketa pê re distira, govendeke xweş hebûya tevî dibû. Hema ku derfeteke biçûk jî bidîta bi zarokên xwe re mijûl dibû û ew jî hezkirina xwe bêpar nedihîştin. Wî nedixwest zêde bi me re li ser pîrsgirêkên siyasîetê biaxive. Heta ku jê dihat nedihîşt em jî nexweşiyên siyasîetê agahdar bibin. Dema ku pir aciz dibû, dilê xwe jî min re vedikir. Lê li ser

pîrsgirêkên navxweyî yên partiyê wî tişteki nedigot. Ew jixwe re dihiştin.

Piştî nexweşî lê giran bû, hûn pê dihisandî ku êdî hêdî hêdî dema xatirxwestinê nêzik dibe?

Na. Wî dizanibû ku pejiirandina wê yekê jî bo min zor e. Min ew derfet nedidayê ku weşiyetê xwe bike, ji ber ku li ser min gelekî giran bû. Wî her digot ku ew jî mirinê natirse û mirin li pêşiya herkesî ye, lê liber diket ku ezê piştî wî li xurbetê bi zarokan re bi tenê bimînim. Girêdan û hezkirineke pîr mezin di navbera me de hebû.

Piştî sê salan êdî Zeyneb Xanim hinekî tunebûna Kekê Hemreş pejiirandiyê yan hîna jî pir zor e?

(Zeyneb Xanim kesereke kûr dikşîne, bêdeng dimîne û li gel rondikên çavên xwe van gotinan dike)

Ez hîna jî lê digirim. Dema ku deriyê me bêzengil vedibe, ez dibêjim waye Hemreş hat. Ez îsal neçûme Kolikê û min gora wî ziyaret nekiriye, bêhna min teng dibe, ez difetisim. Min bi wendakirina Hemreş pir tiştên hêja wendakirin. Min hezkirin wenda kir, min germayî wenda kir, min sebr û aramî wenda kir. Ezê jî te re tişteki bibêjim, ji bo tu bizanibî ew çi qasî mirovekî kubar û nazik bû. Di rojên me yên taybetî de, weke salvegera zewacê yan jî rojbûnê de. Ew serê sibêhê hişyar dibû û ev mal dixemiland. Ez dihatim salonê min didît baqek gul li ser masê ye, ez diçûm medbexê min didît


diyariyeke pêçayî li wir e, min berê xwe bida kuderê ez li tişteki rast dihatim. Sala derbasbûyî, yanî piştî wefata wî bi du salan, ez û zarok em li ser xwarinê bûn, min dît zengilê telefona me lêket. Ne zengilê her carê bû. Muzîka wê ya strana rojbûnê bû. Ez gelekî tirsîyam. Zarokên min bazdan ser telefonê û rakirin.



Em çi bibînin, Hemreş berî mirina xwe dengê xwe tede qeyd kiriye, tede rojbûna min pîroz dike û li ser wê rojê eyar kiriye. Ezê mirovekî wiha çawa jibîr bikim?. Em rojê sê-çar caran bi zarokan re behsa wî dikin... Ez Kolikê bi malê dinyayê tevî nadin, ji ber tirba Hemreş li wir e. Ew tucaran nayê jibîr kirin û tim di dilê me de ye.

Piştî Zeyneb Xanim, keça malê ya mezin Germîn jî van gotinan li ser bavê xwe dike, "Bavê min mirovekî mezin bû, wî em fêrî gelek tiştan kirin, riya rast da ber me. Ew hevalê me bû. Em her roj bi diya xwe re li ser bavo dixivîn, em pir bêriya wî dikin."

Hevpeyvîn: Hêvidar Zana



Bêje

Diyarbakir -13-

Selim Çürükkaya

Bi fermana "Berbi Qawîşa Çaremin ve bimeşel!" û bi gavên birêkûpêk Adem di korîdorê de dimeşînin.

Bi ramana li ser zilma ku li Qawîşa Çaran li hêviya wî ye dest bi meşê kir.

Bi serekî bilind, lê bi ramanên kûr meşa xwe didomîne.

Mewlût Çawîş dehfeke didiyê û dibêje "Tu yê li ve qawîşe yên bi nexweşiya weremê nas bikî!"

Bi vebûna deriyê Qawîşa Çaran re, dengê kuxikeke fetisî bilind dibe.

Dema ku dikeve hundir, ji dûmana cixaran nikare mirovan ji hev derxe, wan baş nabîne.

Çavê xwe difirîne û dixwaze fêrî tariyê bike, wê demê hinek livan dibîne. Piştî ku çavên wî hinekî fêr dibin;

Di nava herdu tiliyên destê rastê yê her nexweşekî weremê de, du cixayên li ber pêxistinê dibîne.

Bi fermana leşkerê komando heste pêdikevin û cixare tîn kişandin.

Bi fermanekê dest bilind dibin û bi fermaneke din ji cixare dikevin nava lêvan.

"Bikşineeeeeee, berdeeeeeee! Bikşineeeeeee, berdeeeeeee!" dibêje û qawîş tije dûman dibe.

Berî ku ew li ser girtiyên ku bi cixarê lixwe didin bigrî, bi piştî stuyê wî digrin û wî derdixin derve.

- 14 -

Adem ji korîdora Qawîşa Çaran berepaş vedigerînin.

Wî dibin hêwana meşê ya Qawîşên 7 û 8an.

Matmayî dimîne û temaşê dike.

"Ev çiyê?" dibêje jixwe re.

Di destê her girtiyekî de sêniyek û kevçiyek heye!

"Oxx! Ya Rebbî! Xuyaye li vir xwarin tê belavkirin" dibêje di serê xwe de.

Girtî, ramanên wî yên saf di çavên wî de dibînin û bi nerînen neçariyê lê dinerin.

Di vebûnê de komando bi ser hêwanê de digrin.

Bi milê çar girtiyan digrin û wan dibin ber qepaxa beton ya coka bin erdê.

Fermanê didin wan ku ew wê qapaxê, rakîn û gû tîxin sêniyê girtiyan.

Ew herçar girtî, sêniyên herkesî tije gû dikin.

Temamê girtiyan sêni û kevçiyê xwe dixin destê xwe, qelewîzka rûdinin û li hêviya fermanê dimînin.

Komando Akın fermanê dide "Dest bi xwarinê bikin çeqelno!" dibêje. Kambur diqire: "Zûbin kuro nûtikno, hejmara dawî sisê ye!"

Di nava sê deqîqeyan de sêni bi kevçiyên tîn paqijkirin. Yê ku paqij nekîrîne ji jixwe re ji awayên êşkencê yekî hildibijêrin!

.... Û Adem li odeyên cehenemê yên Dante digerin.

Pirsa Kurd û Konaxek nû



Dara Bilek

Dixweyê pirs Kurd li Tirkîyê di prosesek nûjen de, ji teref berpirsiyarên dewletê û rewşênîr û hetta dereceyek ji teref raya giştî ya Tirkîyê ve tê mînaqêşekirin. Ev prosesa nû piştî serdana Serekwezîrê Tirkîyê Tayîp Erdogan ya Diyarbakir destpêkîriye û heta wek îro berdewame. Bê goman ev prosesa hanê û herweha cûreyê mînaqêşa tê kirin jibo tevgera Kurd tiştêk nûye û gelekî girînge ji. Dezgehên tarî di nav dewletê de dixwazin vî mînaqêşeyê pûç bikin û rojê va ko pirs Kurd tê xeberdan biguherin. Jibo vî yekê ji gelek leyztikên qirêj wek bûyerên Şemzînaqê dikin.

Lê dixweyê Serekwezîrê Tirkîyê dixwaze vî pirsê di rojê de bihêle. Lê ya herî balkêş ewe ko ev pirs ji aliyê tevgera Kurd ve bi awayê pêwîst naye mînaqêşekirin. Heta guftugoyên li Tirkîyê çêdibin bi alozî hinek rewşênîrên Kurd,

di nav de cîh digirin û dîtînen xwe dibêjin. Lê di rastiya xwe de ya pêwîst nayê kirin. Yanî tevgera Kurd gerek eşkere piştigiriya gotînen Erdogan bike û herweha peyama xwe ya daxwaza diyalog û çareserkerîna pirs Kurd bi awayek aşîti bide raya giştî ya Tirkîyan. Kêmasî di vî konaxa nû de ev yek jibo tevgera Kurd pêwîstîyeke. Mimîkîne di vî warî de tevgera Kurd ne yekdeng be, lê kêmasî gerek ji aliyê xwe ve di nav vî mînaqêşeyê de hebe. Hetta piştigiriya gotarên Erdogan di vî konaxê de wê helwesta wî ji di nav rayedarên dewletê de xurt bike.

Erdogan gelek vekirî dibêje, "Bila hemwelatîya Cûmhûriyeta Tirkîyê bibe nasnameyek mîsterek, herweha bila Tirk,

Kurd û mîletên din bi rihetî nasnameya xwe biparêzin." Wek din dijê vî dîtîna Erdogan gelek partî û kesên nasjonalist dibêjin, "Bila etnik nasname dewletê hebe. Ew ji mîletê Tirk be, di

bin vî bandorê de kemasiyên din dikarin hebin." Me wek Kurd bivê nevê gerek em di vî pirsê de helwesta xwe deynin û gelek zelal bikaribin tiştê jibo berjewendiyên mîletê me baş be biparêzin.

Rastîyek din ji di vî konaxê de Erdogan di pirs Kurd de li muxatabekî digere. Mixabin iro ew muxatab belkî nexweyê yan ji tunebe lê nayê wê manê ko wê sibe ew muxatab peyda nebe. Hinek dezgehên dewletê yên ko ji teref herkesî ve tene zanîn hewlîdînin ko PKK vî temsîlê bike û di

van rojên dawî de gelek vekirî van îşaretan didin raya giştî. Erdogan ji dibêje PKK nikare Kurdan temsîl bike. Başê gerek wek Kurd helwesta me çibe? Gerek ev pirs ji aliyê Kurdan ve bête guftufokirin da ku helwestek di vî warî de zelal bibe.

Bê goman gotar û formûla Erdogan jibo pirs mîletê Kurd li Bakur ne çareserîyeke. Kurd gerek vî baş bibînin. Em mimîkîne gelek gavên bêne avêtin baş bibînin û piştigiriya hinek kiryarên erênî bêne kirin bikin. Lê tu caran ev nayê vî manê ko em jibîrbikin ko em mîletek in. Mafê mîletekî yê rewê di cihanê de çibe yê me Kurda ji li Bakurê Kurdistanê ew e. Dema mirov xwe wek mîletekî bibîne û gora wê yekê armancên xwe yên siyasî kifş bike wê hertim li gora berjewendiyên netewî gav bêne avêtin.

Grûba Kurmancî li Parîsê bû

PK (Parîs) - Grûba Kurmancî ya ku ji sala 1987an û vir ve, bi pêşengîya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ve, her ji şeş mehan carekê dicive hefteya çuyî civîna xwe ya 37an pêkani. Di vî grûbê de ji hemû perçeyên Kurdistanê zimannas hene û ev 18 salin ku liser pîrgîrêkên zimanê Kurdî (Kurmancî) û terminolojiyê dixebitîn.

Di civîna 37an de ev kes amade bûn: Reşo Zîlan (Agirî), Kendal Nezan (Diyarbakir), Lutfî Baksî (Xerzan), Emîn Narozi (Batman), Hemîd Kiliçaslan (Qoser), Mustafa Aydoğan (Qoser), Zinar Soran (Dêrik), Newzad Hirorî (Duhok), Selam Nûman (Qamişlo), Cemal Onursal (Cizîr), Têmûrê Xelîl (Rewan), Xosro Ebdullâhî (Selmas), Salih Akin (Qozlux). Civîna Grûba Kurmancî li Marly Le Roi, navçeyêke Parîsê, pêkhat û hefteyê dom kir. Encamên civîna di kovara Kurmancî de belav dibin. Ev kovar ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ve tê çapkirin û herweha liser malpera Enstîtuyê ji dikare bê xwendin.

Di vî civîna de endamên Grûba Kurmancî liser van mijarên jêrê rawestîyan:

Di Kurmanciyê de pêşbirtik û



paşpirtik

Devoka beriya Mêrdînê

Peyvên stranên Kurmancî

Herweha xebatên terminoliyê ji di van waran de bûn:

Terminoliya Futbolê

Terminolojiya komputer û informatîkê

Terminolojiya ku bi xanî û avahiyan ve têkildar e

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pîrên zaravê kurmancî

Bese! Em dereng û bêdeng nemîn

Abdulkerîm Saruxan

O perasyon li her aliyê welatê min didomîn. Leşkerên Tirk carekê din li Geverê û Şemzînanê dest bi kuştin û talankirinê kirin. Dîsa Kurd tîn kuştin û di bin çavan de tîn wenda kirin. Ez çiqasî nûçeyên ûsa dixwinim, ewqasî pê diêşim. Tiştên di dilê min de dikelin. Hunavê min dişewite. Ez dixwazim bibazim, tev li maratonekê bê dawî bibim. Dakû ez bikaribim bigihijim armanca xwe ya pîroz.

Li gor bawerîya min pir kes, pir hêz û pir rêxistin li hember taktîkên oportunist ne xwedî helwestekê bi zelal û rast in. Ji min ûsa tê ku em bi gelemperî naxwazin gelek tiştên girîng bibînin. Lê belê baş dizanim ku jibo çareserkerîna pîrgîrêka Kurdistanê divê yekîtiya netewî bê xurtkirin û helwestek vekirî, bi militanî were danîn.

Nexweşiya me roj bi roj girantir dibe. Dij-minên me yên hov, zilm û zordariya xwe liser gelê me zêdetir dikin. Xwîn diherike ji bedenên birayên min. Hêstir dibarin ji çavên dayika min. Duhoka rengîn, Cizîr, Hezex, û Nisêbin tîn bîra min. Ez dayikên Omerîyan dibînim ku ji dêlva şîne bigrin, derketine kolanan bi tîllîyan li zarokên xwe xwedî derdikevin. Ew daxwazên xwe yên jibo serxwebûn, azadî û wekhevîyê tînin zimên. Li dijî kiryarên bêhnpeketî derdikevin, azadiyê dixwazin. Dixwazin kelhê zulmê hilweşînin. Dizanim dujmin bi xweşiyê nayên ser rê. Jiber wê ji dixwazin qirêjî û gemara kedxwara ku li ser rûpelên dîroka Kurdistan ya sipî kombûyî pakij bikin. Bi nasnameya xwe jiyaneke bi rûmet dixwazin.

Em ji pêvajoyekê pir nazik derbas dibin. Ji bo em rola xwe rast bilîzin, divê em hêzên xwe xurttir bikin, bibin xwedî helwestekê rast û derengtîr nemîn. Jiber wê divê em bi hevra carekê din bêjin êdî bese. Em destûr nedin ku cografya welatê me yê wek bihuştê zêdetir bê lawitandin.



Jinekolog, mîrekolog, dînekolog, Prof. Dr. **Fatê Were Civatê**

Xaltîka Fatê, ez xebatkarekî Peyama Kurd im. Ez bi xwe Behdîni me, hem Kurmancî zanîm hem jî Soranî. Lê ev tîst

Şêxbat

Li serê min bûye bele û ez nema zanîm ne Kurmancî im ne Soran. Gava hinek telefonê vedîkin û dipirsin "ma Kurmancî li wir hene?" hevalên Soranî min liser xwe hesab dikin û dibêjin "na!" Gava Soranî telefonê vedîkin û dipirsin "ma Soranî li wir hene?" hevalên Kurmancî min liser xwe hesab dikin û dibêjin "na!" Îcar ez rebenê xwedê bûme wek şorba nîskê, ketîme navbera Xelîl û Celîl û gêjo-mêjo bûme. Ji kerema xwe li çareyekê bigere berî ku ez xwe bikujim!

Silêmanê Bêalî / Bonn

Ê lao jixwe ev jî me kêma mabû wey! Min zanibû wê ev herdu zimanok li serê me bibin bele û wêk siyaseta darên me bêjin "ez û ez!" Lawkê mino ev pelûl bi serê min de jî rîyabû. Ez jî wextekî di navbera Xelîl û Celîl de mabûm û min nizanibû ne ez Kurd im û ne Kurdekî! Piştî min jî xwe re programa Kurmancî-Soranî kirî û di mejiyê xwe de bicîh kir. Yanî ez bûm xwediyê navigasyona Kurmancî-Soranî û wê navigasyonê ez kirim wek robotekî otomatîk. Gava kesekî li Kurmancî dipirsî navigasyonê otomatîkî

destê min ê rastê radikir. Hava yekî li Soranî dipirsî destê min ê çepê radibû hewayê û ez jî wê pîrgirêkê xelas bûm. Îcar ez dibêjim tu jî xwe re du lempên rengîn bikire. Yekê zer û yekê kesk. Lempa zer li pişt guhê xwe ê rastê girêbid û a kesk li li pişt guhê çepê. Fişa lempên xwe têxe ya telefonê û qet xwe aciz meke. Bi serê te, gava hinekan li Kurmancî pîrsin, wê otomatîkî lempa te ya zer pêkeve û tê bibî Kurmancî. Jixwe gava lempa kesk pêket jî tu Soranî. Ji wê pêve tu çareyek din nayê bira min. De ka biceribin, heger çênebû emê li çareyekê din bigerin!

Fatê xanim, be serî to emin qurbeserem êdî nêzanim bilêmin çî! Nawî min Ehmedkercaf e we temenim texriben pêncî sal e. Tu êste emin çîwar afretokanî tazem heye, belam dilî min dilê afretokanî pêncem jî bêne. Êste emin di nawberî wîjdanekem de diçem ew alî we dihêmin ev alî, nêzanim ne afretokanî pêncem bihênim yan ne! Êste kêçek 16 salî, çawştin heye, belam berastî min bêgerar im. Min dilêmin min ecele nakem û biryarî xom piştî helbijartinên Kurdistanê bidem, to dilê çî Fatê xanim?

Mahmûd kercaf / Hewlêr

Bismillahirrahmanirrahim! Kaka cîyan, hey segî segbaw, emin bawerim ke piştî jîni pêncem to de bilê "jîni şêşem xoştir e" we to de le kêçek 11 salî bigeritewa! Emin baş dezanim ke Kur-

dekan ditwanin Kurdistan we petroli Kerkûk jî be qurbanî ew îşekan bikeyn. Berastî emin jî dexwazem ke be pêncşêş mîrekên re ew îşan bikeym belam le nexweşî AIDSeke detirsim. Lê emin dilêmin ew gunehî min û to niye. Ew gunehî Hemîd Efendî ye ke serperestî hanîni afretokanî pêncem kird! Belam berastî emin pê nexweş bûm ke jîni pêncem serî Hemîd Efendî xward we bû sebeb ke dest le meqamî wezaretî bikêşe. Heyf! Min ditwanim bilêmin ke êste be çîwar afretokanî xot idare bike, le gel hew programêkî grûpseks çêbikînewa we nawnîşanî ew kêçey 16 saleke binare bo min! Min dê ew kêçey taze kontrol bikeym we le tamî goştokanî ew kêçey temaşe bikeym ka goştokanî ew xoşe yan nexoşe! Piştî min protokolî xom dinarim bo to we pêkve biryarî çêkirinî programêkî grûpseksi şêşem dîdeyn! Baş niye kaka!?

Xaltîka Fatê, ez feqîr im, perê min nînin, birçî û tazi me. Gelo ez çî bikim ku dewlemend bibim?

Ezîzê Parsek / Fransa

Lao Ezîzo, qeşmêr, ma ev jî pîrs e oxlîm! Stuyê xwe bişkîne û here banka Dînyayê bişelîne, têra xwe jî û têra me jî peran bidîze! Xaltîka xwe aciz mekîn û hinekî serê xwe bişuxilînin!

fute@peyama-kurd.com



Beran (21.03-20.04)

Hûnê raserî pêsketinên bi heyecan bîn. Bernameyên nûjen têxin jîyanê, tîştên baş bîafîrin.



Gamês (21.04-20.05)

Hûnê jî pîrgirêkan xilas bibin. Dilê hezkiriyê/ya xwe nehêlin. Xwedî armanc û helwest bin.



Cewî (21.05-21.06)

Jîbo pêserojê armancên we pîrin. Bi hiş û aqilmendî hûnê bîghên armancên xwe.



Kevjal (22.06-22.07)

Xwe û derûdora xwe nexin zorê. Hûnê nûçeyên xêrê bîstînin û bi heyecan têkevin nav keftelêftê



Sêr (23.07-22.08)

Dên û bala xwe bilindtir bikin. Pîrgirêkên xweyên aborî zêde mezin nekin. Erênî û durbîn bin.



Simbil (23.08-22.09)

Hûnê îro dilzîz û ruhtenik bin. Hûn karî derkevin seyranê, kesên balkêş binasin û kêfê bikin.



Mêzên (23.09-22.10)

Rojek xweş e. Hûnê giraniya xwe bidin başkirina aboriya xwe. Çavê gellekan liser we ye.



Dûpisk (23.10-21.11)

Wê nûçeyên bi heyecan jî we tê bîn. Jîbo xebatek bi berhem rojek xweş e. Pêşniyazî hene.



Kevan (22.11-21.12)

Endîşeyên we zêde dibin. Bala xwe bidin ser tîştên baş, jî xeyalan bidûr kevin, guh bidin xwe.



Kovî (22.12-19.01)

Kêfa we li cî ye. Têkiliyên we û hezkiriyê/ya we germtir dibin. Destbela nebin, bêhnfirehî baş e.



Satîl (20.01-18.02)

Xwe jî nav his û xeyalên kûr derxînin. Nedin dî bûyerê, erênî, xwedî helwest û bi biryar bin.



Masî (19.02-20.03)

Hûn bi biryar û xwedî helwest in. Bi erênî û sempatiya xwe hûn bala gellekan dikşînin ser xwe.

Pêkenok

Eskeriya Evdo

Evdo eskeriya xwe wek „behriye“ (eskerê behrê) xelaskiriyê û hatiye gundê xwe. Gundî lê civyane û yekî jê pîrsiye:

-Kuro Evdo, gava torpido jî binê behrê derdikeve çawa av nakeve gemiyê û gemî xewr nabe?


Evdo lê vegerandiye:
-Ma gava tu di binê avê de tir û fîsan dikî av dikeve qûna te? Na!
Sistem eynî sistem!

Çengelpirs

Jin, kebanî, xanim	Mêr, mêrxas	Fermana rakirinê	Berdest, xulamê amir	Daxuyanî Kar, xebat	Serokwezîrê li wêne	Saziya ewlekariya Amerîkayê	Milletek arî
					Qeder, wextê mirinê		
Televîzyonek Itali			Milletek Rojhilata Navin				Xwedî şexsiyet
Cama televîzyonê				Zarok, gede, mindal	Rica, tika, libergerîn		
			Fermana hatinê	Komela xortên sosyal demokratên Swêdê		Rojek	
Milletek ji qewmê Samî	Kesê yekem	Mij û dûmanê, wê baran bê Ecêbmayîn			Nav û deng, li Japonya payedariyek		Şiklekî dewletê
				Zikat, deynê dewletê		Hejmarek Pêşgotinên „fîsas“	
Bergeh, ast, pêngav		Televîzyonek Itali			Serûber, pîvan, wezin		
Çêbû, hat		Nîşana Almaniya					
			Apo, mamo	Oî, bawermendî	Xeyidî, aciz bû		
					Rojek		
						Yek, yekem, deq	Destnîşana kesê duyem
							Destnîşana kesê sêyem
						Bi Ingilîzî çayê	
					Zarok jêre çênabin, bajarokek girêdayî Mêrdînê		



17 Kanûnê 61'mîn Salroja Bilindkirina Ala Kurdistan Pîroz be



Kakşar Oremar

Avesta - 17ê Kanûna sala 1945an di dîroka Kurdan da rojke girîng e. Di rojke wiha da li bajarê Mehabadê komeke ciwan û niştimanperwerên Kurd(ku piraniya wan endamên J.Kê bûn), ala Kurdistanê li ser binaya dadgeha bajarê Mehabadê bilindkirin. Xweşiya wê rojê nayê wesif kirin. Di wê rojê da hinek kes bi dîtina ala sêrenga Kurdistanê ji xwe çûn û haya wan ji dinê nema. Hinekan ji hêsirên keyfxweşiya barandin û silava rêzgirtinê dan ala welatê xwe. Wê rojê li bajarê Mehabadê ne tenê Kurdên Rohhilatê Kurdistanê lê herwiha Kurdên parên din yên Kurdistanê jî hebûn. Ala ya hemû Kurdan bû.

Wê rojê li her dera bajêr alên Kurdistanê dihatin dîtîn. Ala li her derê hatine hildan(bilind kirin). Ala Kurdistanê bi sê rengên kesk, spî û sor ku bi gule genim û şûrekê li ser di nivêkê de hatiye çêkirin, bala herkesî dikîşine ser xwe. Herkes bi awayekî rengên alê, gula genim û şûra li ser ala Kurdistanê ji xwe re şirove dikir. Aştixwaziya netewa Kurd, dewlemendî û bedewiya xaka Kurdistanê, şervanî, mîrxasî û niştimanperweriya Kurdan

di nîşan û rengên ala wan de dihatin dîtîn.

Rengên ala Kurdistanê tev jî xwedî raman bûn:

Sor: Sembola xwîna wan pêşmerge û welatparêzaye yên ku di rêya azadiya Kurdistanê da xwîna xwe rijandin.

Spî: Sembola aştî û azadixwaziya Kurda ye.

Kesk: Nîşana bedewî û rengîniya sirûştta Kurdistanê ye.

Roja di nîva alê da jî ku ji 21 tîjikan pêk tê, sembola geşbûna roj û jiyana Kurdaye.

36 roj piştê yanî di 22.01.1946an an jî di roja ragehandin û bilindkirina ala Kurdistanê da, marşa "Ey Reqîb" jî hat xwindin. Ew roj jî hinek kesan re mîna xewnekê bû. Xewna ku îro di pareke Kurdistanê da ci bi ci bûye.

Di wê rojê da Pêşewayê canfîda bi dîtina ala Kurdistanê wiha qêriyabû:

"Ez bi Xwedê, bi kelmama ezim(mezin)a Xwedê, bi niştiman, bi şerafeta netewa Kurd, bi ala muqedesa Kurdistanê sond dixûm ku heya nefesa canê xwe ya dawiyê û rijandina dilopa xwîna xwe ya herî dawiyê, bi can û mal di riya ragirtina serxwebûn û bilindkirina ala Kurdistanê bixebitim û nisbet bi komara Kurdistan û yekîtiya gelê Kurd û Azerbaycanê, mutî'î û wefadar bimînim."

Birastî jî ew bi vê soza xwe wefadar ma. Ji ber wê jî em dikarin bêjin ku Qazî Mihe-med tenê Pêşewayê Kurd bû ku heya dilopa xwîna xwe ya dawiyê ji bo bilindmayîna ala Kurdistanê û rizgariya gelê Kurd her tiştê xwe fîda kir. Wî canê xwe di rêya armancên

xwe de fîda kir

Di dadgeha leşkerî da jî Îraniyan Pêşewa ji ber van sedeman bi îdamê mehkûmkirin: Îlankirina komara Kurdistan, bilindkirina ala Kurdistanê, derxistina artêşa Îranê ji Kurdistanê û şerê bi wan re û bi dehan karên din.

Ala ku Pêşewa ji ber bilindkirina wê hate şehîdkirin, êdî ji wê rojê û pêda ket destê General Mistefa Barzaniyê mezin. Berhemê xwîna hemû şehîdên Kurdistanê îro bilindbûna ala rengîna Kurdistanê ye ku li başûrê Kurdistanê diheje. Ew yek sal temenê komara Kurdistanê, ji bo her Kurdekê, tev xatireyên xweşin. Ew roj bi cihgehiştina xweziyên dêrîn yên netewekê bûn ku mafê wî hatiye xwarin û zulim lê hatiye kirin. Hivîdarim ku cejnîna bilindkirina ala Kurdistanê rojekê li her sê parên din yên Kurdistanê jî bê pîroz kirin.

kakshar_oremar@yahoo.de



Geschäftsführer: Balsam El-Fauzan
Tel.: (069) 68 30 73
Mobile.: (0171) 9 30 41 26
Fax: (069) 68 09 17 67
 Deutsche Bank.
 Konto-No.:250 577 4, BLZ: 500 700 24
 Wilhelm-Leuchner-Str. 7,
 60329 Frankfurt am Main

✓ Her Duşem
 Ji Frankfurtê di 23:55 an de difire û di 07:20an de digihê Hewlêrê

✓ Her Pêncşem
 Frankfurt 06:15 difirê- Hewlêr 07:20 digihê

✓ Cihê Kurdistan Airlines
 li Balafirxana Frankfurt am Main
 Terminal 2 E
 Schalter: 957 û 958

Kurdistan Airlines طیاران کوردستان

Salon Schritt

Öffnungszeiten

Di. bis Fr. 08:30 bis 18:30 Uhr
Samstag 08:30 bis 16:00

Tel.: 0711 - 47 08 391

Damen & Herren

Schwarenberg Str. 147,
70184 Stuttgart

Listeya bihayê ya ji bo porê Jinan	tenê jêkirina porê kin
18,00 €	8,00 €
tenê jêkirin Porê kin	Şilkutkirin(?)
10,00 €	8,00 €
Porê nivdirêj	Porê zarûkan heya 12 salî
11€	7,00 €
Porê dirêj	Erzanî ji 10.11.05 heya 01.05.06
12,00 €	
Listeya bihayê ya ji bo porê Zilaman	Salonschritt
15,00 €	Schwarenberg Str. 147, 4008391 Stuttgart
	Tel.: 0711- 4708391
	Sêşem heya Înê seat 8:30-18:30, Şemî 8:30-16:00

Zelal



Bayiën Zelal

AKCAN GmbH Hamburg Tel.: 040 723 402 96	ESD Softdrink GmbH Mannheim Tel.: 0621 318 76 70
AKCAN 2 Bremen Tel.: 0421 691 96 78	LIZA GmbH Berlin Tel.: 030 61 62 98 11
CAN GETRÄNKE Essen Tel.: 0201 289 74 17-18	TRINK-One Düsseldorf Tel.: 0211 15 79 881
CAN GmbH 2 Köln Tel.: 0221 37 79 408	TRINK-SEM Dortmund Tel.: 0231 981 86 23

Navenda Zelal

Liza GmbH
Köpenicker Str.
22-25
D-10997 BERLIN
Tel: 030 390 380 30
Fax: 030 390 380 84

70 sal û 100 romanên kurmancî -2-

Ibrahîm Seydo Aydoğan**Hemû romanên kurmancî**

Di hejmara çûyî (67) de m beşê vê lêkolîne yê yekem çap kiribû û ji ber nebûna cihî me ev beşê duyem hiştibû vê hejmarê. Di beşê duyem de em listeya 103 romanên kurdi ku hayê me ji wan çêbûye çap dikin. Listeya me ji kesên ku di warê romanê de herî pir berhem dane dest pê dike

1. Mehmed Uzun

Tu (Dengê Komal-1984, 220 r.)
Rojek ji rojên Evdalê Zeynikê (Orfeus-1987, 154 r.)
Mirina Kalekî Rind (Orfeus-1989, 119 r.)
Siya Evîne (Orfeus-1991, 220 r.)
Bîra Qederê (Sara-1995, 252 r.)
Ronî mîna evîne Tarî mîna mirinê (Avesta-1998)
Hawara Dicleyê (2 cild) (Avesta-2001, 302 r.)
Hawara Dicleyê (cild.2) Avesta-2003)

2. Ereb Semo

Şivanê Kurd (1935) (çapa nû, Ozgur-luk Yolu-1977, Stenbol, 112 r.)
Berbang (Haypethrat, 1959)
Jiyana Bextewar (1959) (çapa nû, Roja Nû-1990, 253 r.)
Dimdim (1966) (çapa nû, Wesanên Roja Nû-1983, 205 r.)
Hopu (1969) (çapa nû, Roja Nû-1990, 208 r.)

3. Lokman Polat

Kewa Marî (Helwest-1999, 272 r.)
Filozof (Helwest-2002, 163 r.)
Rojnamevan (Pêrî-2002, 109 r.)
Robîn (Veng-2004, Stenbol, 173 r.)
Nûrheyata Licî (Helwest-Doz, 2005, 88 r.)

4. Eliyê Evdîrehman

Xatê Xanim (1958) (çapa nû: Belkî, 2004, Amed, 80 r.)
Gundê Mêrxasan (1968)
Şer çiya da (1989)

5. Mahmud Baksî

Hêlîn (Immigrant-institutet-1984, 118 r.)
Gundikê Dono (Orfeus-1988, 107 r.)
Lawikê Xerzî (?) (Nûdem)
Serhildana Mala Eliyê Ünîs (Weşanên Azadiya Welat 2001, 101 r.)

6. Lales Qaso


Se şev û sê roj (Nûdem-1999, 328 r.)
Xezeba Azadiyê (Pelda-2000, 312 r.)
Wêran (Pelda-2002, 303 r.)
Ronakbîr (Pelda-2003, 116 r.)

7. Medenî Ferho

Berxwedan Jiyane (1994)
Mîrza Mihemed (Nûdem-1995, 107 r.)
Xaltika Zeyno (Doz-1998)
Marê di tûr de (Pêrî-1999, 192 r.)

8. Abbas Abbas

1- şivanê Berxan (Pêrî, 2004, 111 r.)
2- Xewnên şiyarî (Pêrî, 2004, 111 r.)
3- Dengbêjê piçûk (Pêrî, 2005, 96 r.)
4- Helbestvan (Pêrî, 2005, 95 r.)

**9. Xursîd Mirzengî**

Sînor (Jindan-1995)
Ristemê Zal (Rewşen-1999, 205 r.)
Belqîtî (Komal, 2004, 251 r.)

10. Brîndar

Xanê (1982)
Soro (1983, 179 r.)

11. Bavê Nazê

Stockholmê te çî dîtiye bêje (Förtattores Bokmaskin-1987, 122 r.)
Çiyayên bi xwîne avdayî (Wesanên Komelâ Jinên Kurdistanê li Swêdê-1989, 240 r.)

12. Sidqî Hirorî

Kurê Zinarê Serbilind (Nûdem-1996, 156 r.)
Evîn û Sewat (Nûdem-1998, 109 r.)

13. Silêman Demîr

Sorê Gulê (Nûdem-1997, 224 r.)
Koç (Roja Nû-1998, 188 r.)

14. Ibrahîm Seydo Aydoğan

Reş û Spî (Doz-1999, 288 r.)
Leyla Figaro (Mîr-2003, 163 r.)

15. Zeynel Abidîn

Binefşên Tariyê (Doz-1999, 176 r.)
Peyman, 1-Girava Stêrkên Vemirî (Havîbûn-2003, 158 r.)

16. Bûbê Eser

Gardiyan (Roja Nû-1994, 165 r.)
Jiyane (Bajar, 2004, 251 r.)

17. Mezher Bozan

Av zelal bû (Du cild, Pêrî-2002, 158 r.)
Av zelal bû 2. (Pêrî - 2004)

18. Eyup Kiran

Dewrêşê Evdî (Mîr-2003)
Pilingê Serhedê (Elma, 2005)

19. Fêrgîn Melik Aykoç

Mamosteyê Zinaran (Rewşen-1999)
Dilên li ber pûkê (Rewşen-2002)

20. Omer Dilsoz

Hêviyên Birindar (Aram-2003, 162 r.)
Bêhnâ Axê (berçem- 2005)

21. Heciyê Cindî

Hewarî (1967) (çapa nû, Roja Nû-1999, 421 r.)

22. Seidê Îbo

Kurdên Rêwî (1979-Erîvan)

23. Xemgînê Temê

Pala Bêşop (Sara-1983, 76 r.)

24. Egidê Xudo

Dê û Dêmarî (1986) (çapa nû, Nûdem-1995, 112 r.)

25. Sahîne Bekirê Soreklî

Wendabûn (Institutya Kurdî Besê Elmanî-1987, 118 r.)

26. Nûrî Semdîn (Nacî Kutlay)

Zeviyên Soro (Weşanên Kurdistan-1988, 313 r.)

27. Ahmedê Hepo (Apiyev)

Birîn (Azernesr-1996, 207 r.)

28. Azad Bavê Sahîn

Yên Perîşan (1991-Beyrûd)

29. Hesenê Metê

Labîrenta Cinan (Welat-1994, 197 r.)

30. Mihemed Dehsîwar

Çiriskên Rizgariyê (Newroz-1995, 314 r.)

31. Ihsan Colemergî

Cembelî Kurê Mîrê Hekarî (Apec-1995, 195 r.)

32. Mustafa Aydoğan

Pêlên Bêrikirîne (Nûdem-1997, 171 r.)

33. Helîm Yûsiv

Sobarto (Avesta-1999, 203 r.)

34. Adil Zozanî

Kejê (Pêrî-2001, 240 r.)

35. Mêvan (Betel Betê)

Bêbextî (?)

36. Torî

Mendik (Berfin-2002, 195 r.)

37. Kemal Orgun

Li Qerexa Şevê Hivron (Sî-2002, 112 r.)

38. Perwîz Cihanî

Bilican (Doz-2002, 511 r.)

39. Remezan Alan

Saturn (Avesta-2002, 151 r.)

40. M. Beşîr

Sofi Remo (Medya-1999)

41. Reşat Aktaş

Veger (Rewşen-2001, 147 r.)

42. Jîr Dilovan

Zenga Zêrîn (Mezopotamya-2003, 272 r.)

43. Enwer Mihemed tahir

Geryan li babê berzê (Aso-2000, Hewlêr)

44. Hesen Silêvanî

Gulistan û Şev (Hawar-1996, Dihok, sala nivîsandinê 1987)

45. Nacî Taha Berwarî

Ew Aşê Deravlewergerandî (Hawar-2002, Dihok)

46. Menaf Osman

Girê Şêran "Serhildan" (Aram-2003, 435 r.)

47. Newroz Saidpour

Viyan (Sî-2002, 206 r.)

48. Jan Dost

Mijabad (Belkî, 2004)

49. Pîr Rustem

Zarokatiya Neynikê (2005, li ser internetê çap bûye HYPERLINK „http://www.mehname.cjb.com“ www.mehname.cjb.com.)

50. Sebrî Silêvanî

1. Ava Mezin (Renc, 2004).

51. Lokman Ayebe

Jar lê Sermest (Belkî, 2004, 134 r.)

52. Wezirê Êşo

1. Pamp Sîpan (1986, 278 r.)

53. Miran Janbar

1. Ardûda (Lîs, 2005, 80 r.)

54. Mîroyê Esed

1- Sisê (1961)

55. Rîza Çolpan

1- Serhatiyên Rustem û namerdiya namerdan (Veng, 2004, 558 r.)

56. Eskerê Boyik

1- Xezeva Xwedê Gundê Ezdiyan (Deng, 2004, 425 r.)

57. Muhsin Abdîlrehman

1- Viyan di demeke jandar de (Duhok, 2005)

58. Bilind Mihemed

1- Sotîngêh (Duhok, 2005)

59. Seydayê Xelatî

1- Evîna Bêtixûb

60. Yağob Tilermenî

1- Kitim (Lîs, 2005)

61. Firat Cewerî

1- Payîza Dereng (Nûdem, 2005, 407 r.)

Roşnvîrî Kurd, heqî kurdan esto ke erdî xo ser xo îdarî bikerî

Amed - Gruba Demokratik a Netewî ya Kurd 17-18î kanûne de Amed de yew civîn viraşt û penî civîn de semedî raya giştî ya vînayê xo eşkira kerd. Gruba Demokratik a Netewî ya Kurd dikat ant politikaya dewlet ya zorbaz û asîmîlekar ser û eşkira kerd ke heqî kurdan esto ke xo bi siyasî, îdarî û huquqî serbets îfade bikerî û erdî xo ser xo îdare bikerî.

4î elûl 2005 de Ankara de hendê 250 roşnvîrî kurd amebî piyesser û semedî çarekerdişî persa kurda mişevirye viraştib. Penî no kombiyayîş de bi namê Gruba Demokratik a Netewî ya Kurd yew grub saz bi. Na grub penî nê heftî de Amed de Otele Prestîj de yew kombiyayîş viraşt. No kombiyayîş 2 rojî rumit. Nê di rojan de Av. Sabahattin Korkmaz û Av. Semir Güzel serrekiye dîvan kerd. Bi giranî HAK-PAR, rêxistin û grubanî sey Serbestî, Demos, Komal, Nubihar, Dema Nû, Kurd - Kom, Grubê hewldayîşî



partiya kurd û sexsiyetanî sey serekî HAK-PAR Ebdulmelik Firat, serekî Kurd Kav Mihemed Celal Baykara û xêlyek roşnvîr û siyasetwanî kurd no kombiyayîş de hedre bi. Hendê 46 roşnvîr û siyasetwananî kurd îta de çareser kerdişî persa kurd, yewbiyayîşî kurdan û awankerdişî yew hereketa sîvil a kurd ser vînayê xo ardî zîwan. Zafê qisekerdoxan ard zîwan

ke gereka bakûrê kurdistan de persa kurd riye siyasî-aşîti esasi yewbiyayîş ser û bi şeklî federasyon biyero çarekerdiş.

Penî kombiyayîş de 39 kesane yew komê xebat niyay rue. Na koma xebat wazîfe da çend kesane û inan vînayê na grûbê ortax formule kerdî. Nê vînayê ortax bi namê Gruba Demokratik a Netewî ya Kurd Ebu-kat Semir Guzel semedî raya

peroyiya eşkira kerd.

Çend madeyî muhim ê no eşkirakerdiş nê yî:

No kombiyayîş semedî yew ca ameyîş û yewbiyayîşî kurdan ameyo hedre kerdiş.

